# DIDAR



www.arsivakurdi.org

# Divê em hevûdu fam bikin!

Îro ji bo me Kurdan li derveyî welêt du nexweşîyên civakî yên sereke hene ku hem ciwan û hem jî dê bav bi xirabî tê digihên û fam dikin. Ji ber wê jî dubendî di nav wan de peyde dibe.

Rastîyek heye ku em pê dizanin, gelek caran ji bo ciwanan her çî biyanî be baş û xweş e, her çî Kurdewarî be xirab û paşketî ye.

Ji bo dê û bavan jî her tiştê ku ne di çarçewa kultur û adet û toreyên Kurdî de bin, xirab û xeter in ku dê û bavê ji me gelekan tûşî wê dibin.

Rastîyek divê bête qebûl kirin ku ji ber gelek sedeman û bi taybetî ji ber nebûna dewleteke me, wek millet em gelek paşketî ne. Ji ber wê jî gava ku em bi rêk û pêkî û baş bi kultura xwe jî nizanibin wê wextê bi taybetî wek ciwan em zû teslîmî kultureke biyanî dibin.

Wekî me got, ciwanên me carna pir zû teslîmî kulturek biyanî dibin, û carna êdî welê dibe ku êdî xwe jî winda dikin. Kultura dê û bavê xwe jî paşketî dibînin ya biyanî an jî Ewrûpî baş û modern dibînin.

Dê û bav jî tam bi eksa wan, kultura biyanî û Ewrûpî wek kulturek xeter û ya gawur û kafiran dibînin û li dij wê radiwestin da ku zarokên wan tûşî vê kultura nû nebin. Û ev dibe dijayetî û dubendîyek di nabêna dê û bav û ciwanan de.

Di vir de kêmasîya herdu alîyan jî heye. Çimkî ciwan baş bi kultura xwe nizanin û ferqîyeta generasyonan jî bi ser de tê, wê wextê problem kûrtir dibe.

Di vê rewşê de berpirsiyarîya mezin dikeve ser milê dê û bavan. Dê û bav, divê ku di hemû waran de tiştên hevbeşên herdu generasyon û kulturan derxin pêş û zarokên xwe li gor wê perwerde bikin daku ciwan hem ji kultura xwe nefret nekin, hem jî zû bi zû teslîmî kulturek nû û biyanî nebin.

Bê guman ev ne tenê problema Kurda ye. Problemên weha îro li hemû alemê hene. Çimkî li vê derê pirsa ku dibe problem û derdikeve pêş ew e ku hevûdu fêmnekkirina du generasyonan e. Ji ber wê jî divê ku her du alî jî ji bo çareserkirina wê bi sebir û bi mentiq hereket bikin.

Mesela ev rastîyeke ku îro li Ewrûpayê gelek malbatên Kurd hene ku hê jî di fikr û tevger û kirinên xwe de gelek prîmîtîv in: Keçên xwe bi zorê li gor daxwaza dilê xwe didin mêr. Hinek keçên xwe naşînin avjenîyê. Hinek naxwazin keçên wan heta dawîyê bixwînin. Çi ji bo kiçan be, çi jî ji bo kuran, gelek dê û bav hene ku naxwazin zarokên wan tiyatro, sînema an tiştekî welê bixwînin, li şûna wê dxwazîya dilê hemûyan ew e ku zarokên wan bibin muhendîs û doktor û hwd.

Bêguman li vê derê berpirsîyarî dikeve ser milê ciwanan jî. Carê ciwan bo ku bikaribin adapteyî kulturek nû bibin, divê ku berî her tiştî bi kultura xwe jî baş bizanibin. Yan na her çî nû ye, modern e, nayê wê maneyê ku baş e. Îro gelek tişt û kirinên nû hene ku ji alî zanistî de bi başî nayê qebûlkirin. Mesela "pûnkarî" "Hippîtî" mumkun e li hinek civatan tiştekî nû be, an jî li hinek civatan "esrar" û "heroin" mumkune tiştekî nû be, lê îro tê zanîn ku hemû jî ne baş in.

Problem wekî me got pir in. Lê ji bo ku van problemana kûrtir nebin, û dayik û bav û zarok ji hev re xerîb nebin, divê her du alî jî bi başî meseleyan çareser bikin, hevûdu baş fam bikin. Ji herdu kulturan jî alîyên baş bigrin.



www.arsivakurdi.org

# DÎDAR

Hejmar: 2, Juli 1992

Kovara Yekîtîya Ciwanên Kurd Li Swêd

Berpirsiyarê Kovarê:
**Şemal**

Berpirsiyarê beşê Kurmancî:
**M. Lewendî**


Dîdar kovara ciwanên Kurd e, salê 6 hejmar derdikeve. Dîdar ji bo hemû xort û ciwanan cîhek e ku bikaribin bîr û rayên xwe tê de belav bikin.
Berhemên xwe: gotar, çîrok, name, tecrube, û biranînên xwe karîkatur, rism û tabloyên xwe, pirs û pirsgirêkên xwe, nûçeyên çalakîyên xwe û hwd bo me binêrin.
Hemû endamên Yekîtîya Ciwanên Kurd mafê wî/wê heye ku bibe peyamber (muxabîr), nivîskar û hevkarê Dîdar'ê. Her çi kesên ku dixwazin hevkarîyê bi me re bikin, bila ji kerema xwe re pêwendîyê bi me re deynin.
Navnîşana Kovarê:


Dîdar
Kurdiska Ungdomsförbund
BOX 49090
100 28 Stockholm

Tel:08/652 85 85 Fax: 08/650 21 20



ISSN 1102-9005



Divê em hevûdu fam bikin.............................. Didar 2

Çawpêkewtinêk legel M. Dadar...................... Şaho 4

Du çîrok.................................................... M. Lewendî 7

Hevpeyivînek bi Kurekî Kurd re.................. Wefa 9

Pêkenîn...........................amadekar: M.L 11

Helbestek ji Rojen Barnas.............................. 12

Hevpeyivînek bi Xurşît re......................Firat Baran 13


Mardin Nejmadin . Wene: Ari Foad


www.arsivakurdi.org

# Çawpêkewtinêk legel Mistefa Dadar

bi amadekirina: **Şaho**

*-Pêşekî be xêrhatintan dekeyn û sipastan dekeyn ke amadey xotan pêşanda bo em giftigoye. Pêş hemû şit dekrê tikatan lê bikeyn ke xotan be xwêneran binasênin?*

-Minîş sipasî êwe dekem ke derfetî ewetan damê ke wa le govarî saway Dîdar da hendê le gel lawekanman bidwêm. Ez Mistefa Dadar im ke le Holand û le zor şwênîtir be dîyar nasrawim. Le Mehabad le binemaleyekî zehmetkêş û bawk kujraw le dayik bûm (bawkî be destî jendermey Şahî Îran şehîd bûwe).

*-Dekrê be kurtî basî çalakîyekanî xotman le derewey wilat bo bikey?*

-Min çalakiyekî ber çawim lew aste da nebûwe ke bikrête melwêkî paraw yan le şirîtêkî baş da bixrête ber çawî gwêgranî hêja. Belam wirde wirde xom xerîkî kar im. Min layengirî muzîk û dostî huner im, belam lew biwareş da xom be şêwazêkî taybet nebestotewe, her çendî şêwazî klasîkim (folklorî) pitir be dil e.

*-Wek xotan bastan kird zor hez le mosîqay folklorî Kurdî deken, daxwa pêtan wa ye em mosîqaye detiwanê wilamderî wîstî lawan bêt?*

-Lawanîş le twêjî ciyawaz pêk dên û hemû xawenî çêjêkî yek çeşn nîn. Diyar e eger ême bixwazîn wilamderî wîstî lawan bîn, ber le hemû şit debê bizanîn wîst û niyazî lawan çi ye ta ew kat bitiwanîn wilamêkî şiyawî bo bidozînewe.

*-Muzîkîş wek zanist û teknolojî geşey sendûwe, ême bo ewey lew biware da zor diwa nekewîn, çi rêgayekman le ber e?*

-Bo ew kare êmeş debê kelk le hemû şêwazekanî mosîqa w amrazekanî biken, îtir le Bethoven ragirtuyetî ta



Qalemerey xoman û Klayderman û Paul Simon ta Prins û Madona û....

Karî xom bo nimûne dênimewe: Le Oktobirî 89 le Holland orkestirêkî 9 kese be serperiştî piyanîstêkî caz, yarmetîyan dam ta goranî "Canê Canê" û "Dîwane bûm"î Hesen Zîrek le ser şêwazî caz nwê bikemewe. Diyar e ewe hengawêkî her çend biçûk, belam nwê bû bo birdine pêş muzîkî Kurdî.

*-Be birwayî êwe govarî Dîdar çon detiwanê le biwarî hunerî da yarmetî lawan bidat?*

-Govarî yekêtî lawan detiwanê rolêkî baş le nêw lawan da bigêrê, be mercêk binaxey le ser demokrasî damezrêt. Mebestim ewe ye ke le wişkebîrî xo biparêzê, nawçegerî welanê, xo be layenêkî taybetî le bo çûn û helwêst da nebestêtewe, şitî heme rengî hebêt bo ewe lawekan pitir zêt û wirya bibnewe. Herweha le biwarî praktîk da be dananî civînî baş û be kelk û bangeştinî hunermendan û hunerdostan çalakî xoy be pîttir kat û bo pitir lêk nêzîk bûnewey du zarawey Kirmanciy Jûrû û Xwarû hewl bidat ta ew lêk namoyîye kemtir bibêt. Le kotayî da serkewtinî hemû hunerdostan be awat dexwazim.

www.arsivakurd.org

# HIŞEKÎ SAXLEM DI LAŞEKÎ SAXLEM DE YE

Dr. Zahir Suran



Jîyana medenîyet û pêşketina mirovayetîyê tesîrek welê li ser mirovayetîyê kirîye ku mecbûr maye li ser hemû alîyên jîyanê bi kûrahî lê bikole û bixebite.
Jiyana mirovî jî ji kar û çalakî û xebatên rojane îbaret e. Ji bo ku mirov bikaribe van çalakîyên xwe yên rojane berdewam bike, divê ku mirov derbareyê tendurustîya xwe de xwedîyê zanîneke temam be. Saxlemîya laş saxlemîya hiş jî bi xwe re tîne. Ji ber wê jî em fikirîn ku ji vê û şûn de di kovarê de em behsa tendurustî û saxlemîya laşê mirovî jî bikin. Ji bo vê jî hevalê hêja Dr. Zahîr SURAN wê her hejmarekê ji we re behsa nexweşîyekê û çareyên wê bike û hem jî wê bersiva her cûre pirsên we bide.
Babeta vê hejmara me derheqê nexweşîyên cinsî (sexsuall) de ye ku ew jî di jiyana mirovî de yek ji girîngtirîn babetan e. Wekî em dizanin di civata me de behsa mewzûyek welê kirin bi serê xwe tabûyek e, hetta qedexe ye.
Wekî me got, her weha di vî goşeyî de emê bersiva her cûre pirsên we jî bidin. Ji ber wê yekê bêtirs û paxaw her babet pirs û derdên xwe ji me re binêrin. Heta ji me bê emê bersiva we bidin.

## NEXWEŞIYÊN CINSÎ YÊN DIRMÎ

**Dr. Zahîr Soran**

Nexweşîyên cinsî yên dirmî (perok/bulaşıcı/smitta) bi riya pêwendîyên cinsî diguhezin û belav dibin û bi navê STD (Sexually Transmitted Diseasses) jî tên naskirin.

A-Nexweşîyên cinsî yên ku bi riya bakterîyan diguhezin belav dibin:

| | |
|---|---|
| 1-Syphilis | 2-Suzenek |
| 3-Klamydia | 4-Nermeşank |
| 5-Limfogranulom | |

B-Nexweşîyên cinsî yên ku bi riya vîrusan diguhezin û belav dibin:

| | |
|---|---|
| 1-Kondîlom | 2-Tamîsk |
| 3-AIDS(HIV) | 4-Zerduyî-B (zertke) |

C-Nexweşîyên cinsî yên ku bi riya parazîtan diguhezin û belav dibin:

| | |
|---|---|
| 1-Candidiasis | 2-Trihomonas |
| 3-Girwêy | 4-Espê |

Nermeşank û limfogranulom di nav civata kurdan de pir nayê naskirin, lê li Ewrupa û Amerîkayê hene.
Li vir nuha emê bi kurtî behsa nexweşîyên cinsî yên ku bi riya bakterîyan belav dibin, bikin.
Ines-Syphilis:
Navê şertên pêketinê "Treponema Pallidum" e, qurp ketina wê jî ji sê rojan heta sê mehan e (yanî ji sê roj heta sê mehan qurp dikeve û di laşê kesê nexweş de diyar dibe).
**Nîşanên vê nexweşîyê**: Mirov pê naêşe, jan û azar nake. Ji roja ku mirov tûşî wê dibe, di nabêna 1-4 hefteyan de birînek li ser organê cinsî (penis, vagina, anus) yên mirovan derdikeve. Mirov bi tayê dikeve,diweste, dibetile, hestîyên mirovî jan dikin û diêşin, por diweşe. Piştî 3-6 hefteyan birîn wenda dibin. Lê piştî 1-2 mehan birîn careke din çê dibin, çunkî bakterîyên wê di laş de bi cih bûne.
**Talûkên wê**:
Eger mirov çarekê jê re nebîne, bakterî bi riya xwînê diçe digihîje mêjî û dilê mirovî, û zerarê digihîne wan. Her weha ji bo jinên hemîle jî talûka wê heye, di zayinê de dikare zerarê bigihîne zaroka wê.
**Çareya wê:**
Kesê nexweş derzîya Penicilin'ê ji bo 10 rojan li xwe dixe, an jî li şûna wê hebên (tabletên) Erythromicin yan jî Tetracyline dixwin.
**Çavdêrîya Nexweş:**
Pêwîste nexweş yekem, sêyem û şeşem meh piştî nexweşîyê tahlîla xwînê bike, piştî salekê dîsa tahlîla xwînê bike daku bizanibe bakterî di laşê wî de maye an ne. Her weha pêwîst e jin û mêr her du jî tahlîla xwîna xwe li nexweşxaneyê bikin.

www.arsivakurd.org

# ÇÎTAN DEWÊ?

Le jimare 1'î govarî Dîdar da witarêk be nawnîşanî "Ême natiwanîn û nabê awa bîn" , be pênûsî Kwêstan bilaw kirabuwe.
Le ber ewey min bawkî çend kiçêkim û witareke min û hemû bawkanî tirîş degirêtewe, be giringim zanî le serî bidwêm, ta ku gutûbêjêkî zanistî û rasteqîne le ser em babete here giringe dest pê bikrêt û bem hoyewe bigeyne encamêkî wa ke bitwanîn êmey bawk gwê le wîst û daxwazîyekanî mindalanman bigrên û gîr û giriftekanîyan çareser bikeyn.
Le rastî da ew witare şitêkî giringî ewtoy nedawete destewe ta kû êmey bawk bizanîn le çi layenêk da beramber be kiçanman kem û kurîman buwe. Giringî witareke tenya lewe da ye ke debête kilîl bo baskirdinî babeteke. Çunke witareke şêweyekî giştî bonî narezayî lê dêt. Belam narezayîyeke le ser çi ye û çon çareser bikrêt baş e, basêkî ewto nekirawe.
Ca bo ewey em narezayîye be şêweyekî aşkira w firawantir basî bikrêt û lêy bikolrêtewe , min em pirsiyarane dexeme rû, takû le seryan bidiwêyin. Çunkû ta êmey bawk nezanîn daxwaz û gîr û giriftekanî kiçman çin, natiwanîn em daxwazîyane be cê bihênîn û ew gîr û giriftane çareser bikeyn.
1-Kwêstan le witarekey da delê: "Le wilatêkî Ewrûpî da jîyan bo kiçêkî Kurd be hoy nebûnî serbestî, zor dijwar e."
Pirsiyarekey min: Mebest le serbestî çi ye? Kiçan le çî bêyeş in?
2-Kwêstan delê: "Dayk û bawkekan zor caran natiwanin be şêwey pêwîst û durust seyrî meselekan biken û zor caran her be şêwey lay xoman seyrî şitekan deken."
Pirsiyarî min: Ew meselane çîn ke bawkekan natiwanin be şêwey durust seyrîyan bikeyn?
3-Kwêstan delê: "Kem wa heye derfetî eweman bêt ke le mer daxwaz û gîr û giriftekanman da bitiwanîn be sanayî le gel dayik û bawikman bidiwêyn yaxud bitiwanîn le ser hendê şit be yek bigeyn."
Pirsiyar: Ew daxwazî û gîr û giriftane çîn?
4-Ew reftare çiye ke kurekan boyan heye bîken û kiçekan boyan nîye?
Le kotayî da delêm: em core gîr û giriftane du layenen, wate cige lewey gîr û giriftî kiçan, hî bawkanîş e. Bo ye pêwîst e her du laman le seriyan bidiwên û çareseryan bo bidozinewe. De fermûn ba gwê le yektirî bigrîn û le ser em layene giringe bidwêyin û lêy bikolînewe takû degeyne amanc. Le gel supasim bo Kwêstan ke le baskirdinî em meseleye destpêşkerî kird.

12/5/1992
Bawkî Nazê





www.arsivakurdi.org

DU ÇÎROK

# BEQ Û MANGE

Carekê beqek li nav çayirekê, ji xwe re dilîze. Mangeyekê dibîne. Ecêb dimîne ku mange çawa weha mezin û qelaw e. Tê nêzîkî mangê. Ew jî dixwaze wekî mangê mezin be. Dest pê dike xwe dinepixîne; "pif pif pif". Û ji mangê re dibêje:
-Binêre ez jî bûm wekî te.
Mange dibêje:
-Tu hîna ji terrîya min biçûktir î!

Beq diqehere, xwe bêtir dinepixîne "pif pif pif"
Mange ji beqê re dibêje:
-Xwe zêde nepixîne, yan na tuyê biteqî û perçe perçe bibî.

Beq guh nade gotinên mangê. Ew dewam dike xwe dinepixîne û pif û pif û pif û bi carekê de "peq" û beq diteqe perçe perçe dibe dimire.

# ŞÊR Û MIŞK

Hebû tunebû, şêrek hebû. Rojekê ji çolê vedigere lana xwe. Dinêre ku mişkekî piçûk di lana wî de ye. Mişk wexta ku şêr dibîne ji tirsa dilerize. Lê şêr dest nade mişkî û jê re dibêje:
-Metirse, ez te naxwîm!

Kêfa mişkî tê, sipasî şêr dike û ji wir diçe. Piştî çend rojan, şêr dikeve nav tora nêçîrvanekî. Dike nake nikare xwe xelas ke. Mişkê ku şêr dest nadabûyê û azad kiribû, tê cem şêr û jê re dibêje:
-Mîrê min ger tu rê bidî ezê alîkarîya te bikim, torê bibirîm te ji vî halî xelas bikim?
Şêr dibêje:
-Na sipas, ez alîkarîyê naxwazim, hêza min heye, ezê bî xwe torê bibirim û xwe xelas kim!

Lê şêr dike nake nikare torê bibire ku xwe xelas bike. Mişk dîsa jê re dibêje:
-Mîrê min tu rê bide ezê torê bi diranên xwe bibirim.

Şêr naçar dimîne, alîkarîya mişk qebûl dike. Mişk bi diranên xwe yên tûj torê dibire, şêr ji nav torê xelas dike. Şêr gelek sipasî mişkî dike û dibêje:
-Hêz ne di mezinî û bîçûkîyê de ye, lê di hiş de ye.
amadekar: **M. Lewendî**

# DI SERDEMA ÎSLAMÎ DE ÇEND DEWLETÊN KURD

Di dema ola Îslamî de, Kurdan li ser axa Kurdistanê dewletên cuda cuda damezrandin. Li gor hoyên wê demê, ew dewlet bûn, lê, dewletên herêmî û di bin serokatîya hinek malbatan de bûn. Lê mixabin, Kurd wê demê nikarîbûn li seranserê Kurdistanê dewleteke mezin û navendî damezrînin. Ji ber vê yekê dewletên herêmî pêk hatin.
Li Kurdistana Başûr, li bajarê Cîbel xanedanekî Kurd bi navê Hesnewî her ku çû otorîta xwe bêtir kir. Di sala 941'ê (P. Z.) de serxwebûna xwe dîyar kir. Pêre pêre rêxistina dewletê û ya ordîyê pêşve bir. Bajarên Hemedan, Mehawand, Kermanşah û Şarezor ketin nav tixûbên dewleta Hesnewî. Dewleta Hesnewî pere û pûl çêkirin. Sîstema aborî ya navendî pêk anî. Li Kurdistanê rê û avahî çêkirin. Dewleta Hesnewî heta sala 1014 jîyana xwe domand.
(Amed Tîgrîs û Aso Germîyanî; Dîroka Kurd û Kurdistanê, Weşanên Koral, Îstenbol, 1991, r: 24)

www.arsivakurdi.org

Çîrok

# HEMETAL

Hemetal cotyarêkî em welate bû. Tewêlî le rengî gilî ew zewîye deçû ke xoşî dewîst û deykêla. Meçekî le liqî ew darberûwane deçû ke le nêwan berdesextekanî kêwe serkeşekan da rijwa bû... Le ber ewey Hemetal nexwêndewar bû neydetiwanî bîrekanî bikate wişey nêw kitêban, çunke endazyar nebû neydetiwanî projekanî le ser kaxezan binexşênê. Belam wêney projekanî le kêlgekey da dekêşa w bîrekanîşî dekirteto û le nêw singî zewîyekey da deyçandin... Tewawî xelkî gund Hemetal'yan xoş dewîst, çunke hemûwan le berî zewîyekey ewiyan deçêşt, herweha le helgirtin û gwazênewey berdezilekanî nêw kêlge û baxekanîyan da yarîdey dedan. Hemetal be azayetî û rawnerî ew gurg û dirindaney le şewanî sardî zistan da hêrişyan dekirde ser gund, denasra.

Rojê le rojan hejdêhayek ber gundî girt û daway dekird ke hemû beyanîyeyek gund çend mindal û mer û bizin bikene xorakî ew. Tirs û lerz kewte dilî xelkî gundewe. Xelkî gund le serbanî mizgewt ko bûnewe bo dozînewey rêgayek bo rizgarbûn le dest em hejdîha tirsnake. Xelkî gund bêcge le das û biwir û tewerdasî cotyarîyekeyan hîç çekêkî tiriyan şik nedebird ke ewanîş be her hemûyan hawtay didanêkî hejdîhake nedebûn. Serokekanî gund biryarîyan da biçine dîtinî hejdîha û daway mifawezatî lê biken belkû kemê le dawakanî kem bikatewe!! Hemetal be tûrîyewe kobûnewey be cê hîşt û gerayewe malê, ew xencere tîjey amade kird ke le bapîrîyewe boy mabiwewe... Beyanî rojî diwayî Hemetal be tenê çû bo zoran girtin le gel hejdîha da. Xelkî gund le zirmey xencer û hawarî hejdîha we aga hatin.

Paş şerêkî zor Hemetal milî hejdîhay perand, belam leşî hejdîha paş perînî her serêk, serêkî nwê bo xoy dirust dekirdewe. Şer çend roj û çend hewtûy xayand, Hemetal'îş bûwe palewanêk ke xelkî gund û gundekanî dewr û piştî pîyayan da heldegut. Xelkî gund destiyan kirde aheng gêran û şaîrekanîş gelêk honraweyan bo ew palewane hiniyewe.

Paş çend hewtû şer le nêwan Hemetalî palewan û hejdîha da, hejdîha zor tûre buwe, be carêk çiwar serî bo xoy dirust kird... Belam Hemetal her kolî neda bo ye hejdîha tiwanî le çend lawe Hemetal birîndar bikat û xwênî Hemetal be ser zewî da birêjê, belam destî, le xencere nîweşikawekey her nedebiwewe.

Deng û basî kujranî Hemetal geyişte xelkî gund. Hendêkiyan biryariyan da termekey le hejdîha bistêninewe, bo ye hêrişêkî herewezîyan bo kird û termekeyan geyandewe gund. Gelêkîş hewlîyan da ke xencere nîweşikaweke le miştî Hemetal derbênin welî neyantiwanî. Xelkî gund biryariyan da termeke her be xencerekewe be xak bispêrin... Lew xakewe bo her lawêkî gund xencerêk lew xencerey Hemetal riwa... Û dilî gişt lawekanî gir da û hêrişîyan kirde ser hejdiya û tiwanîyan mil diway milî biperênin û ew leşeş ke sere nwêyekan dirust dekatewe, let û pet ken. Xelkî gundîş be xoşî û dilşadîyewe geranewe ser kêlgekanîyan û îtir çêjî serkewtinekey Hemetal'iyan hergîz le yad nekird, fêrîş bûn îtir çon be destêk gasinekeyan bigrin û destekey tirîşiyan le ser xencerekanîyan bêt bo bi gij da çûnî her hejdîhayekî tir ke biyewê bikate ser gund...

**Serdarî Sedîq Emîn** kirdoye be Kurdî

www.arsivakurdi.org

# HEVPEYIVÎNEK BI KUREKÎ KURD RE

*** Bi baweriya te li derveyî welat mezintirîn gîr û girifta kurekî Kurd çi ye?*

-Kurek li gor temenê xwe dikare rastî problem û gîr û giriftên cûr bi cûr bê. Kurekî Kurd gava ku ji Kurdistanê tê li welatî wek Swêd ku îmkanîyatên wê gelek in, bi cih dibe, ger nikaribe sinûrekê ji xwe re deyne, dikare tûşî gelek tiştên nebaş û xerab bibe. Ji ber wê jî divê gelek şîyar be. Ji îmkanîyatên vî welatî feydeyê bigre. Kurekî Kurd dikare hevaleka wî ya keç hebe lê di eynî wextê de divê ders û dahatûya xwe jî baş bifikire û bixebite.

***Li malê problemên kurekî çi ne?*

-Dereng fêrbûna ziman, dûrbûna ji kes û kar û welatê xwe, kulturek cihê.. Divê ku mirov evana hemûyan bigre ber çav û paşê li nav malê li probleman bigere û li gor wê çareser bike. Pêwendîyên min bi dê û bavê min re baş e. Xuya ye nabêjim pir baş e, lê tehemmula wan ji a min bêtir e û gelekî li ser min disekinin.

***Bi te berî her tiştî, divê xortên me li vî welatî çi bikin?*

-Bi min xortên Kurd divê ku bi hemû karîna xwe hewl bide daku şîyar be û di vê civatê de bibe xwedî şexsîyetek. Çimkî li vî welatî îmkanîyat pir in, divê em jî feydeyê ji wan îmkanîyatan bigrin. Ji bo vê jî baştirîn rê xwendina ders û mekteban e.

Wefa

# HEVPEYIVÎNEK BI KEÇEKA KURD RE

***Bi baweriya te li derveyî welat mezintirîn gîr û giriftên keçekê çi ye?*

-Yek ji mezintirîn problemên ciwanan ew e ku ew jî pêwendîyên di nabêna keç û kuran de ye.

***Di malê de problemên keçekê wê çi ne?*

-Hurmeta min gelekî ji mezinan re heye, lê wekî tê zanîn di malê de mêr an jî bav xwedîyê cihekî pir giring e. Ji ber wê jî bi min bi qasî ku kur dikare problemên xwe bide diyar kirin keç nikane. Ger carna bide diyarkirin jî bav dikare pir bi tundî li dij derkeve.

***Wek keçekê, bi te keçên Kurd bi çi awayî dikarin wan sinûrên ku dest û piyên wê bestine, piçekî fireh bike?*

-Ez bawer nakim ku mirov hebe riya xerab bi zanetî hilbijartibe. Çimkî her însanek dizane ew çi dixwaze û dîsa zane ku heq heta çi sînorî ye. Bi ya min her kes daxwaz û arzûyên xwe dizane, ji ber wê jî divê mirov pir guh nede qiseyên der û doran û daxwaziyên dilê xwe tenê bi dîtin û raya derdora xwe ve girê nede.

***Bi te keça Kurd divê xwedî karekterek çawa be?*

-Divê bi xwe bikaribe problemên xwe bizanibe û çareser bike an jî li çareyan bigere, her weha bikaribe başî û xirabiyan baş ji hev bigerîne. Muhtacî derveyî xwe nebe, mecbûrî gotinên derdoran nebe.

***Tu dikarî ji me re behsa karekterê tîpê kurekî Kurd bikî?*

- Qiseyên kurekî kurd gelek cihê ye ji kirin û pêwendîyên wî. Mirov gelek caran welê dibe ku êdî bawerîyê bi qiseyên wan nayne.

E.B

www.arsivakurdi.org

# PÊŞBIRKE

**1-Nivîskarê "Naley Cudayî" kî ye?**
A-Şêrko Bêkes
B-Melayê Cizîrî
C-Hêmin

**2- Hilbijartina Parlamentoya Kurdistana Başûr kengî çêbû?**
A-25/3/1992
B-16/5/1992
C-19/5/1992

**3-Nivîskarê "Don Kîşot" kî ye?**
A-Milan Kundera
B-Viktor Hugo
C-Cervantes

**4-Maneya gotina "HÎWA" çi ye?**
A-Kevir
B-Hêvî
C-Xewn

**5-Kaptanê tîpa futbolê ya Hollandayê kî ye?**
A-Andy Goram
B-Andreas Brehme
C-Hans van Breukelen

**6- Ev parçe helbesta ya kîjan şairî ye?**

*Dîlberê îro seher avête cergê min du dox*
*Yek li sîne, yek li dil da, lew ji min tên ax û ox*
*Ax û oxên min ji dil tên, ew ji ber tîra qizil tên*
*Yan ji kovanên di kul tên, jê dizên her xûn û zox.*

A-Ahmedê Xanî
B-Melayê Batî
C-Melayê Cizîrî

**7-Ji van şaîran kê bi zaravayê Dimilî nivîsîye?**
A-Hacî Qadirî Koyî
B-Melayê Xasî
C-Sîyahpoş

**8-Yekem rojnama Kurdî "Kurdistan" li kuderê, kengî derket?**
A-1897, Suleymanîye
B-1898, Qahîre
C-1896, Îstenbol

**9-Li Kurdistana Bakur çiyayê herî bilind kîjan e?**
A-Sîpan
B-Agrî
C-Cîlo

**10-Şêx Se'îdê Pîran kîjan salê şehîd bû?**
A-1937
B-1941
C-1925

| | A | B | C |
|---|---|---|---|
| 1 | | | |
| 2 | | | |
| 3 | | | |
| 4 | | | |
| 5 | | | |
| 6 | | | |
| 7 | | | |
| 8 | | | |
| 9 | | | |
| 10 | | | |

Ji kerema xwe re heta 25.8.1992'yan bersivên xwe bişînin ser adresa kovarê. Emê di nav wan kesên ku bersivên rast dane de, pişkê bavejin, kî qezenc bike wê xelata "Dîdar"ê bigre.

www.arsivakurdi.org




amadekar:
**Mahmûd LEWENDÎ**

## GARIS Û WERÎS !

Yek diçe mala yekî werîs dixwaze. Xwedîyê malê naxwaze werîsê xwe bidê, dibêje:
-Birako me garis li ser werîs raxistîye!
Mêrik:
-Çawa dibe, qet hatîye dîtin ku garis li ser werîs were raxistin?
Xwedîyê werîs:
-Belê dibe, gava ku dil nexwaze garis jî tê raxistin, genim jî!

## MÎVANÊ XWEDÊ

Şevekê li gund yek li derîyê yekî dixe. Xwedîyê malê dipirse:
-Ew kî ye?
Mêrik:
-Ez ji filan gundî me, mîvanê Xwedê me, min qebûl bikin.
Xwedîyê malê ji ber ku naxwaze mîvanan biezimîne, derî vedike û dibêjê "li dû min were" û wî dibe ber derîyê mizgefta gund û jê re dibêje:
-Fermo mîvanê Xwedê, mala Xwedê ev e!

**********************************

**********************************

## LEQEBA WÎ GUHERTIN

Li gundekî mirovek hebû, jê re digotin Ehmedê Ker. Jina mêrik ji vê leqebê gelek aciz dibû. Rojekê ji mêrê xwe re got:
-Rabe berxekî serjêke, muxtar û giregirên gund biezimîne malê û vê leqeba pîs bide guhertin.
Mêrik mîna jinikê got kir. Mêvanan piştî xwarin û vexwarinê ji mêrik re gotin:
-Me leqeba te guhert, ji vê û şûn de emê ji te re bibêjin Ehmedê Dahşik.
Mêrik bi kêf û eşq bazda alîyê malê û gote jina xwe:
-Jinê mizgîna min li te leqeba min hat guhertin, ji vira şûn de navê min Ehmedê Dahşik e!
Jinik:
-Ji dil tu ker î, ma tu nizanî ku dahşik gava mezin dibe, dibe ker !

## KER NE LI MAL E

Rojekê gundîyek diçe mala melê gund û dibêjê:
-Mele xêra mirîyên xwe kera xwe bide min ez pê biçim aş.
Mele:
-Welleh kurê min kera me ne li mal e. Di wê navê de dengê zirrîna kerê ji axur tê.
Gundî:
-Kanê melle, te go ne li mal e, ev çi zirrîn e?
Melle:
-Ma tu ji min bawer dikî yan ji kerê!?

www.arsivakurdi.org

# Helbestek ji Rojen BARNAS

## Ez Mindalekî Çar Salî me, Mamo!

Ez Mindalekî çar salî me, mamo!
Ez mindalekî çar salî
Li kolaneke Mehabada xopan mame
Li kolaneke Mehabadê
Kolanên Mehabadê xir û xalî

Roj,
Mîna kloreke rûnî, ji genimê sorgul
Ku di tendûrê de sorgizirî
Di şebaka me de
li rohilat
li esman
ji min re
Wekî bişirandinên dayika min
dibişirî
Û
Ez nizanim çawa bû, mamo!
Çarşevek ket navbera me
Mîna cubê Îmam Xumeynî tarî
çarşeveke reşvegerî
Û
Mîna tavanê teyrokê
Agir barî
ji balafiran
bi diyarî
yê sala mindalan li me.
Ez mindalekî çar salî me, mamo!
Di sala mindalên dinê de
Ez mindalekî çar salî
Li hewşê
pitik li ber dil
pitik li hembêz
laşekî
Laşekî parî bi parî
cenge cenge
ji bombeyên mêtingehkarî
Ew laş yê
dayika
min e.
Ez mindalekî çar salî me, mamo!
Ez mindalekî çar salî
Ragihînin Dehakê virnî Îmam Xumeynî
Bêjnê:
Te Mehabadê xopan kir
lê
Li ser kavilê
wê
mindalekî çar salî
Niha
Bi avakirina Mehabadek nû,
bilî...
Ez mindalekî çar salî me, mamo!
Ez mindalekî çar salî
Ez niha malokan çêdikim ji xwe re
Ezê ji malokan ava kim Mehabadê
Mehabadek nû;
Ji avahîyên xwêdana min xemilî.

---------------------------

(**Rojen Barnas** ji Bakurê Kurdistanê ye, heta nuha bi navê "Li Bandeva Spêde" û "Heyv Li Esmanê Diyarbekir" du dîwanên wî derketine. Her weha demekê li Kurdistana Bakur li gel hin rewşenbîrên Kurd bi navê Tîrêj kovareke edebî û kulturî jî derxistin. Ew nuha li Swêdê dimîne, ev helbesta wî ya jorîn me ji dîwana wî ya bi navê "Li Bandeva Spêde", rûpel: 150 girt ).

---

## Sitranek ji herêma Culemêrgê

*Ev strana jêrîn kak Şerîf bo me şandîye, em sipasî wî dikin.*

### HEBÊ LEBÊ

Îsal çend e, îsal yêk e
Yêkê me yêk Kurdistan
Hay hebê hebê lebê
Hay hebê hebê lebê

Îsal çend e, îsal du ye
Duyêt me du perde gul
Hay hebê hebê lebê
Hay hebê hebê lebê

Îsal çend e, îsal sê ye
Sêyêt me sê gulsor e
Hay hebê hebê lebê
Hay hebê hebê lebê

Îsal çend e, îsal pênc e
Pêncêt me ferzên Xwedê
Hay hebê hebê lebê
Hay hebê hebê lebê

Îsal çend e, îsal şeş e
Şeşêt me şeşêt beş in
Hay hebê hebê lebê
Hay hebê hebê lebê

Îsal çend e, îsal heft e
Heftên me kewlê jinan
Hay hebê hebê lebê
Hay hebê hebê lebê

Îsal çend e, îsal heyşt e
Heyştên me roja jinan
Hay hebê hebê lebê
Hay hebê hebê lebê

Îsal çend e, îsal neh e
Nehên me bextê jinan
Hay hebê hebê lebê
Hay hebê hebê lebê

Îsal çend e, îsal deh e
Dehêt me li gel hewe
Hay hebê hebê lebê
Hay hebê hebê lebê



www.arsivakurdi.org

# ROVİ Û QIJIK

Qıjıka reşa reşolanki
Venîştıbû ser dareki

Perçeyek penêr dı dêv de
Rovi bêhn gırt hat jı wê de

Hışê rovi de dek û vır
Xwe nêzîkî qıjikê kır

"Roj baş mira mın a qıjık
Tu îro pır rındî bê şık
Ew bejn û bala lı ser te
Weke şahê lı ser text e
Purt û perên te yên delal
Her weke ava zêr zelal
Ma tu hewqas rınd û pak i
Bı mın xweştır e dengê te"

Qıjık da rovi bıbize
Dengê wê bû xize-xize

Devê xwe vekır û qijya
Penêr jı dêv ket nav giya.

Rovi penêr jı erdê gırt
Jı qıjıkê re weha got:

"Ger yên wek te bê hış hebın
Dê jirên wek me her hebın
Lê jı bo vi penêrê te
Ev dê bıbe şiret lı te!"

M. Lewendî

*Stokholm, 1983*



# Hevpeyivînek bi heval **Xurşît** re

***serokê Seksîyona Ciwanên Kurd Li Spångayê***

Heval Xurşît, tu dikarî li ser Seksîyona Ciwanên Kurd Li Spånga (SCKS) hinek informasiyon bidî û piçekî behsa kar û xebata seksîyonê bikî?

Xurşît: SCK Li Spånga, di 1987'an de hat damezrandin. Niha ji 150 zêdetir endamên me hene. Armanca me ew e ku em bikaribin hemû ciwanên Kurdên li Spångayê li dora xwe bicivînin.

Me di 14'ê Adarê de komcivîna xwe çêkir û me dest bi xebatê kir. Ew xebatên me jî bi kurtasî ev in: Me ji bo pîrozkirina cejna Newrozê li navbena Tensta û Rinkeby'yê agir vêxist û xwarin û vexwarin firot. Niha me tîpa futbolê damezrandiye ku di liga (lag) 8. a futbolê de dilîze. Ji bo aborîya seksîyonê, me lotterî firot û ji wê lotterîyê 1600 kron hat. Me heta nuha civînek mezin bi endamên xwe re çêkiriye. Her weha seksiyona me di nav kar û xebatên Komela Spångayê de jî bi awayekî aktîv dixebite.

Di xebatên we de asteng an jî problemên ku derketin pêşîya we çi ne?

Xurşît: Problemên me ji alîyê aborî de gelek in. Em wek Seksîyona Ciwanan ji tu derekî alîkarîya aborî nagrin. Gelek caran em mesrefa aktîvîteyên xwe ji bêrîka xwe didin, mesela wek heqê lîsansê ji bo tîpa futbolê, an jî heqê hekemên maçê.

Daxwaz an pêşniyarek we ji ciwanên Kurd heye?

Xurşît: Daxwaza me ew e ku ciwanên Kurd di nav kar û xebatên seksîyonê de cihê xwe bigrin û bi awayekî aktîv kar bikin. Daxwazek me ya din jî ew e ku Komela Spånga û Yekîtîya Ciwanên Kurd (YCK) di warê aborî de alîkarîya me bikin.

Sipas ji bo vê hevpeyivînê û hêvîdar im di xebata xwe de her serketî bin.

Xurşît: Em jî sipasî we dikin ku we fersend da me ku me Seksîyona Ciwanên Kurd Li Spångayê piçek be jî da nasandin.

*Amadekar: Firat Baran*

# چەند دەوڵەتێکی کورد لە سەردەمی ئیسلامدا*

کورد لە سەردەمی ئایینی ئیسلامیشدا لە خاکی کوردستاندا چەند دەوڵەتێکی جیاوازی دامەزراندووە. بە پێی باری ئەو دەمە، ئەوانە دەوڵەتی هەرێمی بوون و لە ژێر سەرۆکایەتیی هەندێک خێزاندا بوون. بەداخەوە لەو کاتەدا کورد نەیتوانی لە سەرانسەری کوردستاندا دەوڵەتێکی مەزن و ناوەندی دامەزرێنێ. هەر لەبەر ئەوەش بوو چەند دەوڵەتێکی هەرێمی دامەزرا. لە باشووری کوردستاندا، لە شاری جیبەل خانەدانێکی کورد بە ناوی "حەسنەوی"یەوە، هێزی خۆی رێکخست و لە ساڵی٩٤١ی پاش زایینیدا سەربەخیی خۆی ئاشکرا کرد. بەرە بەرە سوپا و دەوڵەتی پێش خست و شاری هەمەدان، مەهاباد، کرماشان و شارەزوور کەوتنە ناو سنووری دەوڵەتی حەسنەوییەوە. دەوڵەتی حەسنەوی پارە و پووڵیشی هەڵکەند و سستێمی ئابووریی ناوەندی پێک هێنا. لە کوردستاندا رێگاوبان و ئاوایبان دروست کردەوە. دەوڵەتی حەسنەوی تاکو ساڵی ١.١٤ دەسەڵاتی هەبوو.

*وەرگیراو لە کتێبی (کورتە مێژووی کورد و کوردستان) نووسینی ئاسۆ گەرمیانی و ئامەد تیگریس. لاپەڕەی ٢٥.

## پیرۆزبایی لە گەلەکەمان
## بە بۆنەی
## هەڵبژاردنی پەرلەمانی نیشتمانی کوردستان !

لە رۆژی ١٧ی یونی لە خوارووی نشتمانەکەمان هەڵبژاردنی گشتی پەرلەمانی نیشتمانی کوردستان سەرکەوتوانە بەڕێوە چوو.ئەو هەڵبژاردنە لە هەل ومەرجێکدا بەرێوە چوو کە رژێمەکانی داگیرکەری کوردستان هێشتا نایانەوێ باوەر بەم راستییە بکەن کە ئیرادەی خەڵک لەم بەشەی نیشتمانەکەماندا سەرەرای هەوڵی بێوچانی دوژمنان بۆ تێکدانی ئەم رەوتە، سەرکەوت.
ئێمە وێڕای پیرۆزبایی لە خەلکی کوردستان، پێمان خۆشە ئەم راستییەش باس بکەین کە ئەو هەڵبژاردنە ئێمرۆ گرینگی زۆر پتری لە هەڵبژاردنێکی ئاسایی هەیە. ئەوە یەکەم جارە گەلەکەمان لە پارچەیەکی نیشتمانەکەی خۆ لەسەر داهاتووی خۆی بریار دەدا، لە لایەکی تر هەر خودی هەڵبژاردنەکە لە رۆژهەلاتی ناوەراستیشدا کە نزیک بە هەموو وڵاتەکانی لە ژێر دەسەڵاتی هەندێ دیکتاتۆر و سەرەرۆدا هەناسە دەکێشن، سەرکەوتنێک بوو بۆ دێموکراسی و شکستێک بۆ سەروەرۆیی.
ئێمە پڕبەدڵ هیوای سەرکەوتن و سەرفرازی پترمان هەیە بۆ گەلەکەمان و هێوادارین یەکەم پەرلەمانی کوردی لە خوارووی کوردستان بتوانی وڵامدەری راستەقینەی ویست و ئارەزووەکانی گەلەکەمان بێت و باشترین سوود لە هەل و مەرجی پێکهاتوو وەربگرێت.

گۆشەی کولتوور

# ژیانی حەریق

حەریق ناوی خۆی سالْح"ە و کوڕی مەلا نەسروڵلاْ بووە. باوکی خەڵکی دەوروبەری هەورامان بووە کە پاشان بەرو خوارووی کوردستان داکشاوە و هەر لەوێش زەماوەندی کردووە و بەمجۆرە لە ساڵی ١٢٧١ کۆچیدا، حەریق لە دایک بووە. حەریق قوتابخانە سەرەتایی و هەروەها سەرف و نەحوی لە لای باوکی خوێندووە وپاشان بۆ درێژەدان بە خوێندن بەرەو شاری سولەیمانی وەرێکەوتووە. لەوێ ماوەیەک لە لای حاجی شێخ محەمەدی بەرزەنجی ماوەتەوە و دوایی بەرەو موکریان رۆیشتووە و پاشان هەستی دەروونی بەرەو شێخی بورهانی رادەکێشێت و بەم جۆرە ژیانی سۆفییایەتی خۆی دەست پێدەکا و لە دەوروبەری "سەقز" نیشتەجێ دەبێت و هەر لەوێش ژن دەخوازێت. واوێدەچێت کە حەریق بینایی خۆی لە دەست دابێت چونکە لە شێعرێکیدا دەڵێ :

رۆژ و شەو فەرقی خەیالْم بێ ئەنیس و بێ نەدیم

چاو نەماوە تا بلْێم قەت خەو لە چاوم ناکەوێ

خەڵکی کەڕ دەستی برا من چاوەڕێی دەستم برا

یەعنی چاو مەبڕە لە دەست کەس رسقی دەست و پێت نەوێ

حەریق لە دوایدا دەچێتە مەهاباد و لە ساڵی ١٢٣٧کۆچیشدا هەر لەم شارە لە تەمەنی ٦٥ ساڵیدا سەر دەنێتەوە و تەرمەکەی لە گۆرستانی مەلا جامیدا دەنێژن.

ئەوەش یەکێک لە غەزەلەکانی حەریق:

چاوەکەم ئەمرو لە گوڵشەن گوڵ بە عیشوە خۆی نواند
نەک نەمەک‌گیر بم بەمەرگی تۆ قەسەم هیچ نەمدواند
گوڵ بە تۆزی پێتەوە لاف و گەزافی لێدەدا
واشوکور سۆزی نەسیمت هات ئەویشی لێ ستاند
نەشتەری موژگانی تۆ هاتونە سەر سەفحەی دڵم

.....................................................................

تۆ لە ئەوەڵ گۆی وەفات هێنایە نێو مەیدانەوە
ئێستە چەوگانی خیلافت پشتی سەد وەعدی شکاند

ئامادەکردنی: فەرهاد جەهان میهەن

سەرچاوەکان تاریخی مشاهر کرد. بابا مردوخ کردستانی

زندگینامەی شمس‌الدین برهانی

شێعرەکانی حەریق

---

دیاری کاک حامیدی درودی ـ لیندسبیری




١. درووی سنەیی

٢. تەڵە

٣. نابیسێ

٤. پێچەوانەی بەڵێ

٥. شاعرێکی بەناوبانگی کوردە.

٦. زمانێکە

٧. پێستە مار

٨. دۆست، برادەر

٩ ـ گۆڤارێکی لاوانی کوردە

١٠. بە سنەیی «وەوی» پێ ئێژن.

١١. نوێ نییە.



www.arsivakurdi.org

# نامە بۆ ڕێکخراوەکانی لاوان لە خوارووی کوردستاندا !

باروودۆخی ئێستای خوارووی نیشتمانەکەمان ئەو دەرفەتەی بۆ ڕەخساندوون تا بتوانین لە گەڵ ڕێکخراوەکانی لاوانی پارچەیەکی کوردستان پێوەندی بگرین، ئەمەش بەشێکە لە ئەرکی یەکێتی لاوانی کورد لە سویددا بۆیەش نامەیەکمان بۆ هەندێ لەم ڕێکخراوانە نووسی. ئەمەش دەقی نامەکەیە:

وێڕای ڕێز و سڵاوێکی گەرم و برایانە و هیوای سەرکەوتنتان !

بەر لە هەمووشت خۆشحاڵی خۆمان دەردەبڕین کەوا دەرفەتێکی وامان بۆ ڕەخسا کە بتوانین ڕاستەوخۆ لەگەڵ لاوانی پارچەیەکی نیشتمانە داگیرودابەشکراوەکەماندا بدوێین. ڕێکخراوی ئێمە، واتە یەکێتی لاوانی کورد ـ سوید لە ساڵی ١٩٨٧ بەیارمەتی فدراسیۆنی کۆمەڵە کوردییەکان لە سوید دامەزرا و هۆی سەرەکی پێکهاتنیشی کۆکردنەوە و ڕێکخستنی لاوان لە ڕێکخراوێکی تایبەتی خۆیاندا بوو تا بتوانین لەم ڕێگایەوە یارمەتی لاوان بدەین بۆ ئەوەی پێناسەی نەتەوایەتی و کولتوور و مێژووی نەتەوەکەمان تووشی مەترسی لەبیرچوونەوە نەبێت. ئێستا یەکێتی لاوان وەک ڕێکخراوێکی دیموکراتی پێوەندی ڕاستەوخۆ لە گەڵ دەوڵەت و ئۆرگانەکانی دەوڵەتی سوید هەیە و لە لایەن ئەوانەوە یارمەتی ماڵیشی دەدرێتێ، بەڵام لە هەمان کاتدا پێوەندییەکی برایانە و زۆر بەهێزیشمان لە گەڵ فدراسیۆنی کۆمەڵە کوردییەکانەوە هەیە و لە ئیمکانات و یارمەتی بێدرێغی ئەوانەش بێبەش نین. یەکێتی لاوان نزیک بە ١٥٠ ـ ٢٠٠ ئەندامی (نێوان تەمەنی ٧ ـ ٢٥) کۆکردۆتەوە و لە ڕێگای جۆراوجۆرەوە چالاکیکانی خۆی بەڕێوە دەبات؛ لەوان بە دانانی ئاهەنگ و سیمینار، بەشداری لە میتینگ و خۆپیشاندان دژی ڕژێمە داگیرکەرەکان، کۆکردنەوەی یارمەتی بۆ گەلەکەمان، بڵاوکردنەوە و ئاگادارکردنەوەی بیرورای گشتی لەدەرەوەی وڵات سەبارەت بە باروودۆخی تراژیدیکی لاوان و منداڵانی کورد لە ژوورەوە و هەروەها دانانی کۆرسی زمان، موسیقا و هەڵپەرکێ وهتد. هەروەها یەکێتی لاوانی کورد ـ سوید گۆڤارێک بە ناوی "دیدار" وەک ئۆرگانی ڕەسمی خۆی بە دوو زاراوەی کرمانجی سەروو و خواروو بە دوو مانگ جارێک دەردەکات.

لەم ساڵانەدا بە پێی توانا و دەرفەت هەوڵمان داوە ئەرکەکانمان ڕاپەڕێنین، دیارە لە ئێوەی ناشارینەوە کە کەم و کوڕیمان زۆر بووە. یەکێک لەم ئەرکانەمان، گرتنی پێوەندی و بەهێزکردنی لە گەڵ لاوان و ڕێکخراوەکانی لاوان لە ناوەوەی نیشتمانەکەماندایە، کە بەداخەوە تا ئێستا لەم بوارەدا بە هۆی باروودۆخی ناڵەبار و نائاسایی وڵاتەکەمان کارێکی شایانی باسمان نەکردووە.

ئێستا بە خۆشییەوە گەلەکەمان لە خوارووی نیشتمانەکەماندا سەرکەوتنێکی مەزنی وەدەست خستووە و بۆیەش ئەم دەرفەت و بوارەش بۆ ئێمە ڕەخساوە تا بتوانین کەڵکی لێوەرگرین و پێوەندی بە ڕێکخراو و ... دیموکراتییەکانی لاوانی وڵاتەکەمان بکەین. لەو پێوەندییانەدا ئێمە چ مەبەستێکمان هەیە؟

بە کورتی دەتوانین پەنجە بۆ ئەم خاڵانە ڕاکێشین :

* بۆ ئەوەی ئاگاداری کار وبار و گیروگرفتی یەکدی بین.
* لەم بوارانەدا کە لە توانامانداهەیە، بتوانین یارمەتی یەکدی بکەین.
* لێرە بە پێی ئیمکانیاتێک کە هەمانە ئاوێنەیەک بین بۆ ڕەنگدانەوەی گیروگرفت و ویست و داخوازەکانی ئێوە و ئێوەش بەپێچەوانە بۆ ئێمە.
* بۆ ئەوەی بتوانین ئەو بۆشاییە پڕ کەینەوە کە دوورە وڵاتی و گوشاری فەرهەنگی بێگانە لێرە بۆ لاوەکانمانی پێکهێناوە و لە لایەکی تریش ئێوە بتوانین تا ڕادەیەکی ئاگاداری چۆنییەتی کاروبار و چالاکی و ویست و داخوازەکانی لاوانی ئەورووپیش بن.

دیارە بۆ ئەو مەبەستانە ئێمە دەتوانین لە ڕێگای نووسین و ناردنی بابەت بۆ یەکدی پێوەندییەکانمان بەهێز کەین و ئەگەریش بۆمان دەست بدا، دەکرێ لە هاتوچۆش کەڵک وەربگرین. بۆ وێنە بە ناردنی گۆڤار، بەیان و هەواڵی چالاکی یاخود گیروگرفتەکان، ناردنی وێنە و بەڵگە لەمەڕ لاوان، نووسینی وتار و بەرهەمەکانی لاوان و ...... دەتوانێ تا ڕادەیەکی زۆر ئەم بۆشاییەی نێوانمکان پڕکاتەوە. دیارە ئێمەش بە نۆرەی خۆمان هەوڵ دەدەین، بەڵام ئیمکانات و دەنگ و باسەکە لای ئێوە زیاتر و گرینگترە.

لە کۆتاییدا زۆرتان سوپاس دەکەین و پڕبەدڵ سەرفرازی و سەرکەوتنتان بۆ بەئاوات دەخوازین.

یەکێتی لاوانی کورد ـ سوید

ستۆکهۆڵم ١٩٩٢.٧.١٥

www.arsivakurdi.org

# گۆشەی بیروڕا

***بە بڕوای ئێوە گەورەترین گیروگرفتی کیژێک لە دەرەوەی وڵات چییە ؟**

پێوەندی لە نێوان کچ و کوڕدا، یەکێک لە گەورەترین گیروگرفتەکانی لاوانە . زۆربەی کچ و کورەکان وێنەیەکی لە پێشڕاسازکراویان لێکتر هەیە، تێگەیشتنە زۆربەی جاران هەڵە و ناراستە.

***کیژێک لە چوارچێوەیماڵێدا تووشی چ گرفتێکی سەرەکییە ؟**

پێوەندی نێوان لاوەکان و دایک و باوکیان گەلێک لاوازە. باوک لە خێزاندا شتێکی بەرزە. من دژی ڕێزنان لە گەوران نیم، بەلاٚم نە بەو چەشنە کە کچێک بۆی نەبێ و نەتوانێ به راحەتی لە گەڵ دایک و باوکی خۆی بدۆی. گەلێ جاریش کە گیر و گرفتێک دێتە پێش، کچی ماڵێ ناوێری لایان باس بکا، هۆیەکەشی ترس لە بەرتەکی(ردفعل) باوک یا دایکێتی.

*** وەک کیژێک پێتوایە کچێکی کورد چۆن دەتوانێ هەندێ لەو سنورانەی کە دەست و پێی بەستۆوە. ببڕێت ؟**

ئەز باوەڕ ناکەم چ مرۆڤێک هەبێ ڕێگای خراپ بە وشیارییەوە هەڵبژێرێ، هەر ئینسانێک دەزانێ چی دەوێ و زۆر جاران دەشزانێ تا چ ڕادەیەک حەق بەوییە. پێم وایە هەموو کەس دەبێ بوی هەبێ بە پێی ویست و ئارەزووی خۆی ڕەفتار بکا و زۆر لە قسەی دەورووبەری نەسڵەمێتەوە. دیارە مەبەستم لەو ڕەفتارانەیە کە بە سوودی لاوێکە.

*** کیژی کورد دەبێ خاوەنی چ کاراکتێرێک(کەسایەتی) بێ ؟**

دەبێ پتر متمانەی بە خۆی بێ و بتوانێ چاک و خراپ لێک هەلاٚوێرێ و بۆ بەرژەوەندی خۆی هەنگاو بنێتەوە و چاوەڕوانی ئەوە لە کەس نەکات کە پێی بڵێی کە کچی کورد مافی چییە و چی نییە !

***دەتوانی وێنەی تیپیکی کاراکتێری کوڕێکی کوردمان بو باس بکەی ؟**

قسە کردنی کوڕێکی کورد جیاوازێکی زۆری هەیە لە تەک ڕەفتار و کردەوەی. مرۆڤ ڕەفتاری وا لە وان دەبینێ کە ناچار دەبێ زۆر جاران باوەر بە قسەکانی نەکات.

ا.ب.

*** بە بڕوای ئێوە گەورەترین گیروگرفتی کوڕێک لە دەرەوەی وڵات چییە ؟**

لاوێک بە پێی تەمەنی دەتوانێ ڕووبەڕووی گیروگرفتی جۆراوجۆر بێت و ئەوەش بە گوێرەی تەمەنی ئەو کەسە جیاوازی هەیە. لاوێک کە دێتە ولاٚتێکی وەک سوید، بە هۆی ئیمکاناتی فرەی ئێرە و دواکەوتوویی و نەبوونی ئیمکانات لە کوردستانی داگیرکراو، ئەگەر وشیار نەبێ و نەزانێ کە چۆن کەلک لەو ئیمکاناتە وەربگرێ، دەتوانێ زیان بە خۆی و داهاتووی بگەیەنێت. کوڕێکی کورد دەتوانێ یاری کچیشی هەبێ و لە هەمان کاتدا بەباشی بتوانی بە دەرس و دەوری ڕابگات.

***کوڕ لە چوارچێوەی ماڵدا تووشی چ گرفتێکی سەرەکییە ؟**

دایک و باوکەکان بە زۆر هۆ، لە وان درەنگ فێر بوونی زمان، دووری لە کەس و کار و وڵات، فەرهەنگی جیاواز و ... لە ژێر گوشارن و ئێمەش لە پێوەندییەکانماندا دەبێ ئەوانە لە بەرچاو بگرین. پێوەندی من لە تەک دایک و باوکم باشە و ئاسایییە، دیارە نالێم زۆر باشە، بەلاٚم ئەوان تەحەمولیان لە من پترەو و ئێستاش زیاتر لە جاران دلسوزی و ڕێزیان بۆم هەیە.

*** وەک کوڕێک پێتوایە چۆن دەکرێ لە هەندەران بەربەرەکانی هەندێ لەو گیروکرفتانەی ڕووبەڕووی لاوان بۆتەوە، بکەین** پێم وایە کوڕێکی کورد دەبێ بە هەموو تواناوە هەوڵی ئەوەبدات کە لە کۆمەڵگای نوێدا خاوەن کەسایەتییەک بێت و بتوانێ دەورێکی شیاو بلیزێت. لێرە ئیمکانات زۆرە و ئێمە دەبێ کەڵکی لێوەربگرین و دەرس خوێندنیش باشترین ڕێگایە بۆ گەیشتن بەم ئامانجە. تێکەلاو بوون لە تەک دۆست و برادەری سویدیش دەتوانێ تا ڕادەیەک یارمەتیمان بدات لە ناسینی پتری کۆمەڵگا و چۆنییەتی هەلس و کەوتمان لەم کۆمەڵەدا.

وەفا



www.arsivakurd.org

# گۆشەی پێشبڕكێ

١ . نووسەری دیوانی "زریان " كێیە؟
A . شێركۆ بێكەس
B . ئەنوەر قادر محەمەد
C . هێمن

٢ . یەكەم هەڵبژاردنی پەرلەمانی خوارووی كوردستان لە چ ڕۆژێكدا بوو ؟؟
A .١٩٩٢/٣/٢٥
B .١٩٩٢/٥/١٧
C . ١٩٩٢/٥/١٩

٣. نووسەری كتێبی "دۆن كیشۆت" كێیە؟
A . میلان كوندێرا
B . خ.ل.بورخێس
C . سێروانتێس

٤. مانای وشەی"پەیڤ" چییە؟
A . بەرد . گاشە بەرد
B . قسە
C . هێما . ئیشارە

٥. چ وڵاتێك كاسی ١٩٩٢ی ئەورووپای لە فوتباڵ بردەوە ؟
A . هۆڵەندا
B . ئەڵمانیا
C . دانمارك

٦. یەكێتی لاوانی كورد . سوید لە چ ساڵێك دامەزرا؟
A . ١٩٨٧
B . ١٩٨٨
C . ١٩٨٦

٧. "كوین كۆستنێر" لە كام بواری هونەریدا چالاكی دەنوێنێ؟
A . موزیك
B . سینەما
C . ئەدەبیات

٨ . چیای شاهۆ لە كام بەشی كوردستان هەڵكەوتووە؟
A . خوارووی كوردستان
B . ڕۆژهەلاتی كوردستان
C . باكوری كوردستان

٩. شێخ سەعیدی پیران لە چ ساڵێك شەهید كرا؟
A . ١٩٣٧
B . ١٩٤١
C . ١٩٢٥

١٠ . ئەم دێڕە شیعرە هی كام شاعیرە ؟
قوربانی تۆزی ڕێگەتم ئەی بادی خۆش مروور
ئـەی پەیـكی شارەزا بە هەمـوو شـارەزوور
A ـ مەحوی
B . نالی
C . حەریق

تكایە وەڵامەكانتان تا ڕۆژی ( ٢٥ )ئاگۆستی بەناوو نیشانی گۆڤارەكە پۆست كەن. لە نێو ئەو كەسانەی وەڵامی ڕاستیان دابێتەوە بە پێی شانس و بەخت یەك كەس خەلاتی " دیدار"ی پێ دەبڕێ.

| | A | B | C |
|---|---|---|---|
| ١ | | | |
| ٢ | | | |
| ٣ | | | |
| ٤ | | | |
| ٥ | | | |
| ٦ | | | |
| ٧ | | | |
| ٨ | | | |
| ٩ | | | |
| ١٠ | | | |

# پۆستەی دیدار

بۆ هاورێیانی گۆڤاری دیدار

جوانترین پیرۆزباییتان
کەین بە بۆنەی دەرکردنی یەکەمین ژمارەی
گۆڤاری یەکێتی لاوان، کە بە راستی دەنگی
لاوانی کوردە لە ئاوارەییدا.

هیواداریـن لـە خزمـەت کـردنـی ئـەدەبـی کـوردی لـە دەرەوەی ولاتدا هـەمیشـە بەردەوام بن و بەرهـەمەکانـتان هەمیشە بەسوود و پاراو بێت بۆ لاوانی کورد.

ئێمەش وەک کۆمیتەی کارگێری لاوانی کورد ـ بەشی یۆتۆبۆری دووبارە پیرۆزباییتان لێدەکەین و پشتگیریتان دەکەین بۆ ژمارەکانی داهاتووی گۆڤارەکەمان.

هەر شاد و سەرکەوتوو بن.

*کۆمیتەی کارگێری لاوانی یۆتۆبۆری*

---

دیداری بەرێز سڵاو !

دیدارم بە "دیدار" شاد بوو و پیرۆزباییتان لێدەکەم و ئاواتە خوازم کە هەر لە سەرەتاوە کارەکانتان بە جوانی بو بچێتە پێش. زۆر سوپاس کە دیدارتان بۆ ناردم، جێگای شانازییە بۆ گەلەکەمان کە هەر وۆژ لە سوچێکی جیهانەوە رۆژنامەیەک دێتە دونیا، بە تایبەتی گۆڤاری دیدار کە هیٚ لاوانی خوێن گەرمی ولاتەکەمانە لە هەندەران. جارێکی دیکە پیرۆز باییتان لێدەکەم. من بەش بەحاڵی خۆم ئامادەم بۆ هەر چەشنە یارمەتییەک، خۆم ئابوونە دەکەم و هیوادارم هەموو ژمارەکانم بۆ بنێرن ..................

بەرێز و حورمەتەوە
براتان حامید درودی
لیندێنسبیری ـ ١٩٩٢/٥/٤

---

*خوێنەرانی بەرێزی گۆڤارە ساواکەی "دیدار "*
*وێڕای سڵاو، تـەنـدروسـتـی و سـەرکـەوتـنـی هـەمـوو لایەکتان بە ئاوات دەخوازین.*

*لەو ماوەیەدا کەسانێکی زۆر لە لاوانی خوێنگەرمی سوید گۆڤارەکەیان بەسەر کردەوە و بە ناردنی بابەتی جوراوجۆر پشتگیری ئێمەیان کردووە. ئێمە وێرای سوپاسێکی یەکجار زۆر هەر لێرەدا پێمان خۆشە پێتان رابگەیەنین کە:*

*دیدار، کاتێک دەتوانی ببێتە گۆڤاری راستەقینەی ئێوە، کە ئێوە بە ناردنی نووسین و بابەتی هەمەچەشنی خۆتان یارمەتی بدەن و ئێمە گەلێک خۆشحاڵین کە وا پاش یەکەم ژمارە وا بە گەرمی و دڵ فرەوانییەوە بابەتتان بۆ ناردوین.*

*بەڵام بە داخەوە دەبی ئەوەش بڵێین کە بە هۆی کەم دەرفەتی بەراستی بۆمان نییە کە هەمووی ئەو وتار و بابەتانە بڵاو بکەینەوە. لە بڵاوکردنەوەی بابەتەکاندا ئێمە ئەم چەند خاڵە لەبەر چاو دەگرین:*

*١ـ بابەتەکە تا کورتتر بێت، بۆ چاپ پتر دەست دەدات.*
*٢ـ بابەتی نوێ و دووپاتنەکراوە، وەپێش ئەوانیتر دەدرێت.*
*٣ـ ئەگەر چەند بابەتێکمان هەبێ، لە پلەی یەکەمدا هی ئەو کەسانە چاپ دەکەین کە تا ئێستا هیچمان لێ بڵاونەکردوونەتەوە.*
*٤ـ بابەتێک کە وێنەی دەگەڵ بێت، زۆر پتر یارمەتی ئێمە دەکات. وێنە دەکری وێنەی نووسەرەکەی بێت یاخود لە پێوەندی لە گەڵ بابەتەکە.*
*٥ـ بابەتێک کە پێوەندی راستەوخۆی بە لاوان و گیروگرفتی ئەوان هەبێ، زووتر بڵاودەکرێتەوە.*

*لەم ماوەیەدا ئەو خۆشەویستانە بابەتیان بۆ ناردووین*
*شلێر حەیدەری ( شێعر و وتار. دونیای لاوان)*
*فەرهاد جەهان میهەن (شێعر. بارانی ئەسرین)*
*ئاڤان نەجمەدین( نامەیەکی ئاوەڵا بۆ کچانی کورد )*
*سەرداری سدیق ئەمین( چیرۆک ـ ئەسپەرێ)*
*جوعە.ج.ک.(شێعر ـ زوڵف کورت)*
*شوان(شێعر ـ چاوەکەم)*
*حەمیدی تەیموری(چیرۆک ـ پلان/مستێک خورما)*
*ئاکۆ نەجمەدین(*

*زۆرتان سوپاس دەکەین و هەول دەدەین لە ژمارەکانی داهاتوودا بە گوێرەی پێویست کەڵکیان لێوەرگرین.*

*دیدار*

www.arsivakurdi.org

کورتە چیرۆک

سەرداری سدیق ئەمین
کردویە بە کوردی

# حەمەتاڵ ٧

حەمە تاڵ جوتیارێکی ئەم وڵاتە بوو. تەوێڵی لە ڕەنگی گڵی ئەو زەوییە دەچوو کە خۆشی دەویست و دەیکێڵا. مەچەکی لە لقی ئەو دارەبەڕووانە دەچوو کە لە نێوان بەردە سەختەکانی کێوە سەرکەشەکاندا ڕوا بوو ... لە بەر ئەوەی حەمەتاڵ نەخوێندەوار بوو نەیدەتوانی بیرەکانی بکاتە وشەی نێو کتێبان، چونکە ئەندازیار نەبوو نەیدەتوانی پرۆژەکانی لە سەر کاغەزان بنەخشێنێ. بەڵام وێنەی پرۆژەکانی لە کێڵگەکەیدا دەکێشا و بیرەکانیشی دەکردە تۆو و لە نێو سنگی زەوییەکەیدا دەیچاندن ... تەواوی خەڵکی گوند حەمەتاڵیان خۆش دەویست، چونکە هەمووان لە بەری زەوییەکەی ئەویان دەچێشت، هەروەها لە هەڵگرتن و گوازینەوەی بەردە زلەکانی نێو کێڵگە و باخەکانیاندا یاریدەی دەدان. حەمەتاڵ بە ئازایەتی و ڕاونەری ئەو گورگ و دڕندانەی لە شەوانی ساردی زستاندا هێرشیان دەکردە سەر گوند، دەناسرا.

ڕۆژێ لە ڕۆژان هەژدیهایەک بەر گوندی گرت و داوای دەکرد کە هەموو بەیانییەک گوند چەند منداڵ و مەڕ و بزن بکەنە خۆراکی ئەو. ترس و لەرز کەوتە دڵی خەڵکی گوندەوە. خەڵکی گوند لە سەربانی مزگەوت کۆبوونەوە بۆ دۆزینەوەی ڕێگایەک بۆ ڕزگار بوون لە دەست ئەم هەژدیها ترسناکە. خەڵکی گوند بێجگە لە داس و بێور و تەوەرداسی جوتیارییەکەیان هیچ چەکێکی تریان شک نەدەبرد کە ئەوانیش بە هەر هەموویان هاوتای ددانێکی هەژدیهاکە نەدەبوون. سەرۆکەکانی گوند بڕیاریان دا بچنە دیتنی هەژدیها و داوای مفاوزاتی لێ بکەن بەڵکو کەمێ لە داواکانی کەم بکاتەوە !! حەمەتاڵ بە تووڕەییەوە کۆبوونەوەی بەجێ هێشت و گەڕایەوەماڵێ، ئەو خەنجەرە تیژەی ئامادە کرد کە لە باپیرییەوە بۆی مابوەوە.... بەیانی ڕۆژی دوایی حەمەتاڵ بە تەنێ چوو بۆ زۆران گرتن لە گەڵ هەژدیهادا. خەڵکی گوند لە زرمەی خەنجەر و هاواری هەژدیها وەئاگاهاتن.

پاش شەڕێکی زۆر حەمەتاڵ ملی هەژدیهای پەڕاند، بەڵام لەشی هەژدیها پاش پەڕینی هەر سەرێک، سەرێکی نوێ بۆ خوی دروست دەکردەوە. شەڕچەند ڕۆژ و چەند هەوتووی خایاند، حەمەتاڵیش بووە پاڵەوانێک کە خەڵکی گوند و گوندەکانی دەوروپشتی پیایاندا هەڵدەگوت. خەڵکی گوند دەستیان کردە ئاهەنگ گێڕان و شاعیرەکانیش گەڵێک هۆنراوەیان بۆ ئەو پاڵەوانە هۆنیەوە.

پاش چەند هەوتوو شەڕ لە نێوان حەمەتاڵی پاڵەوان و هەژدیهادا، هەژدیها زۆر تووڕە بوو، بە جارێک چوار سەری بۆ خۆی دروست کرد ... بەڵام حەمە تاڵ هەر کۆڵی نەدا بۆ یە هەژدیها توانی لە چەند لاوە حەمەتاڵ بریندار بکات و خوێنی حەمەتاڵ بەسەر زەویدا بڕێژێ، بەڵام دەستی . لە خەنجەرە نیوەشکاوەکەی هەر نەدەبوەوە.

دەنگوباسی کوژرانی حەمە تاڵ گەیشتە خەڵکی گوند، هەندێکیان بڕیاریان دا تەرمەکەی لە هەژدیها بستێننەوە، بۆیە هێرشێکی هەرەوەزیان بۆ کرد و تەرمەکەیان گەیاندەوە گوند. گەلێکیش حەولیان دا کە خەنجەرە نیوەشکاوەکە لە مشتی حەمەتاڵ دەربێنن وەلێ نەیانتوانی. خەڵکی گوند بڕیاریان دا تەرمەکە هەر بە خەنجەرەکەوە بە خاک بسپێرن ... لەو خاکەوە، بۆ هەر لاوێکی گوند خەنجەرێک لەو خەنجەرەی حەمەتاڵ ڕوا ... و دڵی گشت لاوەکانی گڕ دا و هێرشیان کردە سەر هەژدیها و توانیان مل دوای ملی بپەڕێنن و ئەو لەشەش کە سەرە نوێیەکان دروست دەکاتەوە، لەت و پەت کەن. خەلکی گوندیش بە خۆشی و دڵشادییەوە گەڕانەوە سەر کێڵگەکانیان و ئیتر چێژی سەرکەوتنەکەی حەمەتاڵیان هەرگیز لە یاد نەکرد، فێریش بوون ئیتر چۆن بە دەستێک گاسنەکەیان بگرن و دەستەکەی تریشیان لە سەر خەنجەرەکانیان بێت بۆ بەگژداچوونی هەر هەژدیهایەکی تر کە بیەوێ هێرش بکاتە سەر گوند ......

*****



www.arsivakurdi.org

# Stoppa rasism

# منالان و راسیزم

## från : Stisksjö och Västermalms skolor i Sundsvall

Ingen människa föds till rasist,man blir rller inte blir rasist redan som barn.
( Ylra Fröberg. Förskollärare / Sundsvall )
*****

Jag tycker att vi ska stoppa rasismen,
( Sandra Jonsson 12 år)
*****

Jag tycker att utläningarna ska få bo här, men inte för många.
(Karolin Larsson 11 år)
*****

Jag tyvker att de invandrare som finns i Sverige ska få lika rätt i samhållet som svenskar.
(Mattias Andersson 11 år)
*****

Jag tycker inte rasism betyder något för mig
( Vohan 17 år)
*****

När jag hör ordet rasism tänker jag på : våld, trämlingshat och olika kulturer.
( Rickard 17 år )
*****

Invandrar hat, våld!
(P.L. 16 år )
*****

De som håller på med rasism vet inte mycket om invandrare.
( Henrik 17 år )
*****

بۆ ئەوەی بتوانین سودی پترمان بۆ لاوانی کوردی پەریوەی سوید هەبێ، یەکێتی لاوانی کورد ـ سوید داوا لە هەموو کۆمەڵەکانی لاوان و هەروەها لە هەموو لاوێکی کورد دەکات کە بە پێشکەش کردنی پێشنیاری بەسوود یارمەتیمان دەدەن ئێمە پێویستیمان بە پرۆژەی نوێ و بەکەڵک هەیە بۆ لاوان، بۆیەش بەرەو پیری هەموو چەشنە پێشنیارێک دەچین.

**چاوەروانی پێشنیارەکانی ئێوەین.**

## "دیدار"تان بە دڵە ؟

بیرورا و بۆچوونی خۆتانمان بۆ بنووسن. پێتان وایە چۆن بکەن "دیدار" دەتوانێ پتر بەدڵتان بێت ؟ دەزانن بۆ ئەوەی دیدار بتوانی بە راستی ئاوێنەیەک بێت بۆ رەنگدانەوەی ویستی ئێوە، دەبی هەر ئێوە خۆتان رێگامان پێ نیشان دەن ؟ کەوایە ئاگادارمان کەنەوە، « **پێتان وایە "دیدار" دەبێ چی تێدابێت ؟** »

www.arsivakurdi.org

# هۆنراوە

## ژانێکی ئارام

من لە نێوان چواردیواردا
خۆم دەبینم.
ترووسکەیەک
لە پەنجەرەی دیوارەرەوە
لە ئاسماندا ماچم دەکا
هەر پەنجەرەی ژوورەکەمە
هاوخەمی من.
دنیا گۆڕاو و
ئاسمان گۆڕاو
روخسارەکانیش گۆڕاون.
کێیە هاوخەمی من،
هەر خەمە و خەم !
کێ دەزانێ من چیم دەوێ ؟
ئەوانەی کە تێمگەیشتن
لێم دابڕان.
سنوورەکان دەنگیان دەخزن
بە هاوخەمەکانم بەندن
ئامانجەکانی من.
دوورە وڵاتی چەکێکە و وادەمکوژێ و
ئاوارەیش هێزێکە و دەمترسێنێ و
هێندێ هێندێ دەمئەنجنێ.
ئاوارەیی دووکەڵێکە و
مرۆڤ ون دەکا،
وەرن با لە ناوی بەرین ...

ئاکۆ نەجمەدین

* ئەم شێعرە پێشتر لە گۆڤاری Intrnational Tidning بە ناونیشانی ژانێکی لەبەرەخۆ بڵاوکراوەتەوە و لێرە بە



## پایزی قژکاڵ

تارمای شەو دەگەڵ رێژنە بارانەی
ئێوارەی پایزی زەرد
رابردووی تاڵ و تفتی
بن سێبەرە دارە گوێزەکان دێننەوە بهیر.
باڵندەکان لە تریشقەی هەور رادەپەڕن !
دەریا خرۆشاوە و ......
زەوی بە ئارامی، دڵۆپ دڵۆپ
ئاواتەکانی هەڵدەمژێ
ئەو سوار چاکەی لە مەڵبەندی نادیارەوە هاتبوو
ئارەزووەکانی تێکەڵی لێزمەی باران بوون و
بە گەرووی زەویدا رۆچوون.
خەزان و گەڵاکان بە نامۆیی رەشبەڵەکێ
بۆ ناشتنی تەرمی هاوین دەبەستن !
وەرزی تازە، لێرەوە دەست پێدەکا
لە پرسەی تەرمی هاویندا و
بەرەوپیری پایزی قژکاڵ.

ع.راد

www.argivakurdi.org

## گۆشەی ئەدەب

# ( ئەمرۆ رۆژێکی بەرچاوە )



ئەمرۆ رۆژێکی بەرچاوە، رۆژی تۆیە
رۆژی دوێنێت لە کیس چووە
هیچی تری ناچێتە سەر
زێتر لەوەی کە پێت داوە
ئاگاداری سبەی نیت
کە چی ئەمرۆت هەیە
سوودی لێوەرگرە، مەیدە بە فیرۆ
ئەمرۆ دەتوانی کەسێ دڵشاد کەی
ئەمرۆش دەتوانی کەسێ فریاد کەی
ئەمرۆ رۆژێکی بەرچاوە، رۆژی تۆیە ئەمرۆ

شێعر: ئۆسا هۆگمان( Asa Hogman)
وەرگێر : ئیڤا

---

*خوشکێکی بەرێزمان بە ناوی لەیلا لە "فینلاند"ەوە نامەیەکی گەرم و جوانی وێرای شێعرێکی خۆی بە ناوی « توخوا بای شەماڵ نۆرەمە هەستە» بۆ ناردووین. لەیلا لە نامە جوانەکەیدا دەنووسێ:" من کچێکی کوردم و لە "هێلسینکی"پێتەختی "فینلان"دا دەژیم. ناوم لەیلایە و تەمەنم ١٧ ساڵە و لە ئەسڵدا خەڵکی شارەزوورم، بەڵام لە زووەوە لە کەرکوک ژیاوم."*

*لەیلا دەڵێ :"دەورووبەری نەورۆز بوو... یادی ساڵانی بەر لە ئاوارەییم دەکرد ... لە رۆژی ٩١/٢/١٢دا لە ساعەتی یەکی نیوەرۆ تا هەشت و نیوی شەوێ بیرم لێکردەوە ئەبوایە بە چەشنێ هەستی خۆم دەربریبایە. بیرم کردەوە دیتم بای شەماڵ بە هاواری هەموو کەسێکەوە هاتووە، بە هاواری دڵداران، نەخۆشان و غەریبان ، بۆیە بە ناوی "توخوا بای شەماڵ نۆرەمە هەستە و ... " دەستم پێکرد و ...*

*دیدار پڕ بەدڵ سەرکەوتنی لەیلای ئازیز بە ئاوات دەخوازێ و چاوەروانی نامە و بەرهەمی زیاترێتی.لێرەش بەشێک لە شێعرەکەی بڵاو دەکەینەوە. زۆر بەداخەوەوە بە هۆی درێژی نەمانتوانی بە تەواوی بڵاوی بکەینەوە. هیوادارین دڵی لێمان نەهێشێت.*

## توخوا بای شەماڵ نۆرەمە هەستە

پەیامی دووری هەست و ئەڤینە — پەیامی دڵە و دڵیش برینە
دەزانی رێگەی نیشتمانەکەم — لانەی شێرانم، کوردستانەکەم
نیشان بەو نیشان کە کێوی بەرزە — کچی روومەت مەند، لاوانی تەرزە
پەیامم بەرە بۆ گەلی کوردی — بۆ کوردستانم، هێدی بەوردی
بو ئازیزانێ کە خەباتگێرن — جوانمێر و ئازا و مەرد و دلێرن
بۆ خوێندکارانی ژیر و بەناوی — بۆ گچکە وگەورە، بۆ کیژو لاوی
بۆ کرێکار و فەلای بەکارم — بۆ دایک وخوشکی دێهات و شارم
پەیامێ بەرە بۆ مایەی ژینم — بۆ کوردستانی چاو بەئەسرینم
بۆ گڵکۆی بەرزی شەهیدانی کورد / — ئەوانەی مەرگیان پێشکەش بە ژین کرد
بۆ ئەو کوردستانەی سنور والآیە — دەشتی سەنگەر و چیای قەلآیە
بۆ رەز و باغی وێنەی بەهەشتی — سووڵ و بەفراو و سەیرانگەی گەشتی
........................ — ........................
دەسا نۆرەتە شەماڵ دەی هەستە — پەیامم بەرە بۆ ئەو مەبەستە
بڵێ بە کوردی چەوساوەی دلێر — نەورۆزە هەستە راپەڕە وەک شێر

لەیلا حوسێن عەبدوللا

www.arsivakurdi.org

# کۆمەڵەی لاوانی ستۆکهۆڵم بناسین!

*کۆمەڵەی لاوانی ستۆکهۆڵم*، لە کۆمەڵێک لاوی کۆمۆنەکانی ستۆکهۆڵم، نەکا، هودینگە و وەرمدۆ و...... پێکهاتووە. بەگشتی نزیک بە ۲۰۰ ئەندامی لەدەوری خۆی کۆکردۆتەوە و یەکێک لە چالاکترین کۆمەڵەکانی لاوانی یەکێتی لاوانی کورد ـ سویدە.

بەڕێوەبەرانی ئەم کۆمەڵەیە، واتە کۆمیتەی کارگێری لە ۷ کەس پێکهاتووە کە لەراستیدا تەنیا چوارکەسیان چالاکیان لەم بەشەدا هەیە. ئەندامانی کۆمیتەی کارگێر بریتین لە: شاهۆ، فەرهاد، وارۆژ، کوێستان، دڵنیا، سەحەر و شەڤدەر.

کۆمەڵەی لاوانی ستۆکهۆڵم لە ماوەی شەش مانگی رابردوودا کومەڵێک چالاکی بەنرخی نواندووە کە لێرە بە کورتی ئیشارەیەکیان پێدەکەین:

* ۱۹۹۲/۱/٤ شەواهەنگی لاوان بە بەشداری نزیک ۱۵۰ کەس پێکهێنا. لەم شەواهەنگەدا چەند هونەرمەندێکی لاو بەشدارییان هەبوو، لەوان: میکاییل، ئەردەڵان و تیپی زاگرۆس و ....... ئەم شەواهەنگە بە هەڵپەرکێ و دانس تا ۲ی نیوەشەو درێژەی کێشا.

*لە ۱۹۹۲/۱/۱۸ کۆمەڵەی لاوانی ستۆکهۆڵم، ئەرکی ئامادەکردن و پێراگەیشتنی کۆنگرەی پێنجەمی یەکێتی لاوانی کورد ـ سویدی گرتەئەستۆ و سەرکەوتوانە ئەم ئەرکەی بەجێگەیاند.

*لە رۆژی ۱۹۹۲/۲/۲۸ شەواهەنگێکی لە هۆڵی تینستاتریف وەڕێخست کە نزیک بە ۱۳۰کەس تێیدا بەشدار بوون. لەم شەوەدا هونەرمەندی لاو مستەفا دادار و هەروەها هونەرمەندی دەنگ خۆش میکاییل و چەند گروپێکی مۆسیقای ترپرۆگرامەکەیان رازاندبۆوە. هەروەها پێشبڕکەیەک کرا کە شلێر حەیدەری ئەندامی کۆمەڵەی لاوانی سوندسڤاڵ خەڵاتی پێشبڕکێکەی پێبرا (کە بریتی بوو لە کامێرایەک).

هەروەها چەند شەوێکی تر کە ئەم کۆمەڵەیە بەڕێوەی بردووە. لە چالاکییەکانی تر دەتوانین پەنجە بۆ چەند دانەیکیان راکێشین، لەوان :

* بەشداری و ەڕێوەبردنی کاروباری پراتیکی خۆپێشاندانی ۱ی گوڵان

* بەیارمەتی چەند لاوێکی کۆمەڵەی ستۆکهۆڵم و یەکێتی




Foto: Shaho. Kh

لاوان و یارمەتی بێدریخی کاک رەزا (راهێنەر)، تیپی فوتباڵی شاهۆ چالاکییەکی باشی نواند. لەوان لە شەش مانگی رابردوودا پتر بەشداری لە دە پێشبڕکێدا هەبووە و هەروەها ئەمساڵ بەرەسمی لە پێشبڕکێ تیپەکانی لاوانی ستۆکهۆڵم بەشداری کرد.

لە کۆتاییدا پێویستە سوپاسێکی یەکجار زۆری کاک میکاییلی جەهان میهەن بکەین کە بە یارمەتی بێدریخی خۆی چ لەبەڕێوەبردنی کارەکان وچ بەبەشداری و ڕێکخستنی ئاهەنگەکان قورساییەکی زۆری کارەکانی وەئەستۆ گرتبوو. هەروەها سوپاسی گروپی مۆسیقای زاگرۆس دەکەین کە لە زۆربەی شەواهەنگەکاندا بەشداری چالاکیان هەبوو.

*ستۆکهۆلم ـ شاهۆ.خ*



www.arsivakurdi.org

# چیتان دەوێ ؟

لە ژمارە (١)ی گۆڤاری دیداردا، وتارێک بە ناونیشانی :«ئێمە ناتوانین و نابێ ئاوا بین » بە پێنووسی کوێستان بڵاو کرابۆوە.

لە بەر ئەوەی من باوکی چەند کچێکم و وتارەکە من و هەموو باوکانی تریش دەگرێتەوە، بە گرنگم زانی لە سەری بدوێم، تاکوو گوتوبێژێکی زانستی و راستەقینە لە سەر ئەم بابەتە هەرە گرنگە دەست پێ بکرێت و بەم هۆیەوە بگەینە ئەنجامێکی وا کە بتوانین ئێمەی باوک گوێ لە ویست و داخوازییەکانی منداڵانمان بگرین و گیروگرفتەکانیان چارەسەر بکەین.

لە راستیدا ئەو وتارە شتێکی گرنگی ئەوتۆی نەداوەتە دەستەوە تاکوو ئێمەی باوک بزانین لە چ لایەنێکدا بەرامبەر بە کچانمان کەم و کوڕیمان بووە. گرنگی وتارەکە تەنیا لەوەدایە کە دەبێتە کلیل بۆ باسکردنی بابەتەکە. چونکە وتارەکە بە شێوەیەکی گشتی بۆنی نارەزایی لێ دێت، بەڵام نارەزاییەکە لە سەر چییە و چۆن چارەسەر بکرێت باشە، باسێکی ئەوتۆی نەکراوە.

جا بۆئەوەی ئەم نارەزاییە بە شێوەیەکی ئاشکراوفراوانتر باسی بکرێت و لێی بکۆڵرێتەوە، من ئەم پرسیارانە دەخەمە روو، تاکوو لە سەریان بدوێین، چونکوو تا ئێمەی باوک نەزانین داخوازی و گیروگرفتەکانی کچانمان چین، ناتوانین ئەم داخوازییانە بە جێ بهێنین و ئەو گیروگرفتانە چارەسەر بکەین.

١. کوێستان لە وتارەکەیدا دەڵێ :" لە وڵاتێکی ئەورووپیدا ژیان بۆ کچێکی کورد بە هۆی نەبوونی سەربەستی، زۆر دژوارە."

پرسیارەکەی من : مەبەست لە سەربەستی چییە؟ کچان لە چی بێبەشن ؟

٢. کوێستان دەڵێ :" دایک و باوکەکان زۆر جاران ناتوانن بە شێوەی پێویست و دروست سەیری مەسەلەکان بکەن و زۆر جاران هەر بە شێوەی لای خۆمان سەیری شتەکان دەکەن."

پرسیاری من : ئەو مەسەلانە چین کە باوکەکان ناتوانن بە شێوەی دروست سەیریان بکەن ؟

٣. کوێستان دەڵێ :" کەم واهەیە دەرفەتی ئەوەمان بێت کە لە مەڕ داخواز و گیروگرفتەکانماندا بتوانین بە سانایی لە گەڵ دایک و باوکمان بدوێین یاخود بتوانین لە سەر هەندێ شت بە یەک بگەین."

پرسیار: ئەو داخوازی و گیروگرفتانە چین ؟

٤. ئەو رەفتارە چییە کە کوڕەکان بۆیان هەیە بیکەن و کچەکان بۆیان نییە ؟

لە کۆتاییدا دەڵێم: ئەم جۆرە گیروگرفتانە دوو لایەنن، واتە جگە لەوەی گیروگرفتی کچانە، هی باوکانیشە. بۆیە پێویستە هەر دوو لامان لە سەریان بدوێین و چارەسەریان بۆ بدۆزینەوە. دەفەرموون با گوێ لە یەکتری بگرین و لە سەر ئەم لایەنە گرنگە بدوێین و لێی بکۆڵینەوە تاکوو دەگەینە ئامانج. لە گەڵ سوپاسم بۆ کوێستان کە لە باسکردنی ئەم مەسەلەیە دەستپێشکەری کرد.

***« باوکی نازێ »***
١٩٩٢/٥/١٢

---

# دەزانن کە :

*** ڕێمۆند کانتوێل خاوەنی ڕیکۆردی درێژترین نامەنووسینە لەجیهاندایە. مانتوێل خەڵکی شاری ئاکسفۆردی ئینگلیستانە کە لە رۆژ ٢٥ی ئاگوستی تا ١٦ سێپتەمبری ١٩٧٨ بۆ کۆکردنەوەی یارمەتی بۆ نەخۆشخانەی ڕیدکلیف ٣٩٩٨ نامەی بە دەست نووسی.

*** هانس لانگسێت (١٨٤٦.١٩٢٧) خەڵکی وڵاتی نۆرویژ خاوەنی درێژترین ردێن بووە. کاتێک "هانس"یان لە ساڵی ١٩٢٧ لە شاری "کینسێت"ی ئەمریکا دەناشت، ردێنی ئەم کابرایە ٥ میتر و ٣٣ سانتیمێتر بوو.

ماسوریا دین کابرایەکی هیندی خاوەنی درێژترین سمێڵ بووە. سمێڵی ئەم پیاوە کە ٢/٥٩ مێتر بوو.

---

## «سرودی کوردی»

کۆمەڵە سرودێکی کوردییە کە دانا ماردین کۆی کردۆتەوە و تارا ماردین وێنەی بەرگ و نیگارەکانی کێشاوەتەوە. مافی لەچاپدانی ئەم نامیلکەیە بە کۆمەڵەی کورد لە ڤێستروس بەخشراوە.

www.arsivakurdi.org

گۆشەی چاوپێکەوتن

# چاوپێکەوتنێک لە گەڵ هونەرمەندی لاو:
# مستەفا دادار

ئامادە کردنی : شاهۆ.خ

** پێشەکی بەخێرهاتنتان دەکەین وسوپاستان دەکەین کە ئامادەیی خوتان پێشاندا بۆئەم گفتگۆیە. پێش هەموو شت دەکرێ تکاتان لێبکەین کخۆتان بە خوێنەران بناسێنن ؟*

منیش سوپاسی ئیوە دەکەم کە دەرفەتی ئەوەتان دامێ کەوا لە گۆڤاری ساوای "دیدار"دا هەندێ لە گەل لاوەکانمان بدویم. ئەز مستەفا دادارم کە لە هولەند و زۆر شوێنی تر بە دیار ناسراوم. لە مەهاباد لە بنەماڵەیەکی زەحمەتکێش و باوک کوژراو لە دایک بووم.(باوکی بەدەستی ژاندەرمی شای ئێران شەهید بووە)

** دەکرێ بەکورتی باسی چالاکییەکانی خۆتمان لە دەرەوەی وڵات بۆ بکەی ؟*

من چالاکییەکی بەرچاوم لەو ئاستەدا نەبووە کە بکرێتە مەلوێکی پاراو یان لە شریتێکی باشدا بخرێتە بەر چاوی گوێگرانی هێژا. بەڵام وردەوردە خۆم خەریکی کارم.من لایەنگری موزیک و دۆستی هونەرم، بەڵام لەو بوارەشدا خۆم بە شێوازێکی تایبەت نەبەستۆتەوە، هەرچەند شێوازی کلاسیکیم(فۆلکلۆری) پتر بەدڵە.

** وەک خۆتان باستان کرد، زۆر حەز لە مۆسیقای فۆلکلۆری کوردی دەکەن،داخوا پێتانوایە ئەم مۆسیقایە دەتوانێ وڵامدەری ویستی لاوان بێت ؟*

لاوانیش لە توێژی جیاواز پێک دێن و هەموو خاوەنی چێژێکی یەک چەشن نین. ، دیارە ئەگەر ئێمە بخوازین وڵامدەری ویستی لاوان بین، بەر لە هەموو شت دەبێ بزانین ویست و نیازی لاوان چییە تا ئەو کات بتوانین وڵامێکی شیاوی بو بدوزینەوە.

** موزیکیش وەک زانست و تێکنولوژی گەشەی سەندووە، ئێمە بۆ ئەوەی لەو بوارەدا زۆر دوانەکەوین، چ ڕێگایەکمان لە بەرە ؟*

بو ئەو کارە ئێمەش دەبێ کەڵک لە هەموو شێوازەکانی موسیقا و ئامرازەکانی بکەن، ئیتر لە بیتهۆوین را



Foto: Shaho.Kh

گرتوویەتی تا قالەمەڕەی خۆمان و لە کلایدرمەن و پاول سیمۆن تا پرینس و مادۆنا و ......

کاری خۆم بۆ نموونە دێنمەوە: لە ئۆکتۆبری ٨٩ لە هۆڵەند ئۆرکەسترێکی ٩ کەسە بە سەرپەرشتی پیانیستێکی جاز، یارمەتیان دام تا گۆرانی " جانی جانی" و "دیوانە بووم"ی حەسەن زیرەک لە سەر شێوازی جاز نوێ بکەمەوە. دیارە ئەوە هەنگاوێکی هەر چەند بچووک، بەڵام نوێ بوو بۆ بردنە پێشی موزیکی کوردی.

** بە بڕوای ئێوە گۆڤاری "دیدار" چۆن دەتوانی لە بواری هونەریدا یارمەتی لاوان بدات؟*

گۆڤاری یەکێتی لاوان دەتوانێ ڕۆڵێکی باش لە نێو لاواندا بگێڕێ، بە مەرجێک بناغەی لە سەر دیموکراسی دابمەزرێت. مەبەستم ئەوەیە کە: لە وشکەبیری خۆ بپارێزێ، ناوچەگەری وەلانێ، خۆ بە لایەنێکی تایبەتی لە بۆچوون و هەڵوێستدا نەبەستێتەوە، شتی هەمەرەنگی هەبێت بۆ ئەوە لاوەکان پتر زیت و وریا ببنەوە. هەروەها لە بواری پراکتیکدا بە دانانی جێژنی باش و بەکەڵک، و بانگەشتنی هونەرمەندان و هونەردۆستان چالاکی خۆی بەپیتتر کات، و بو پتر لێک نزیک بوونەوەی دوو زاراوەی کرمانج ژوورو و خواروو هەوڵ بدات تا ئەو لێک نامۆییە کەمتر بێت.

لە کۆتاییدا سەرکەوتنی هەموو هونەردۆستان بەئاوات دەخوازم.

www.arsivakurdi.org

گۆشەی تەندروستی

# نەخۆشییە درمیە زایەندییەکان

## (Sexually Transmitted Diseasses)

نووسین و ئامادەکردنی: د. زاهیر سوران
وێنە : ئاری فوئاد

نەخۆشییە درمیە زایەندییەکان بریتین لەم نەخۆشیانەی بە ڕێگای پەیوەندی زایەندییەوە(جنسی) دەگوێزرێنەوە و بڵاو دەبنەوە.

. ئەم نەخۆشییانە ناسراون بە « Sexually Transmitted Diseasses » کە کورتکراوەکەی بە ئاسایی « STD » دەنووسرێ.

*A ـ نەخۆشییە زایەندییە بەکترییەکان:* ئەو نەخۆشییانەن کە بە هۆی بەکتریاوە دەگوێزرێنەوە. کە بریتین لە:

١. سیفلیس ٢. سوزەنەک
٣. کلامیدیا ٤. نەرمەشانک
٥. لیمفۆگرانولۆم

*B ـ نەخۆشییە زایەندییە ڤایروسییەکان:* ئەو نەخۆشییانەن کە بە هۆی ڤایروسەوە دەگوێزرێنەوە، کە ئەمانەن :

١. کۆندیلۆم ٢. تامیسک
٣. ئیدز(Hiv) ٤. زەردویی جۆری B (زەرتکە)

*C ـ نەخۆشییە زایەندییە پاراسیتەکان :* ئەو نەخۆشییانەن کە بە هۆی پاراسیتەوە(جۆرە کرمێکی وردی تایبەتییە) دەگوێزرێنەوە کە ئەمانەن:

١. کاندیدیاسیس ٢. تریھۆمۆناس
٣. گرونی ٤. ئەسپێ

ئەوەی شایانی باسە، نەرمەشانک و لیمفۆگرانولۆم لە کوردەواریدا زۆر ناسراو نین، بەڵام لە ئەوروپا و ئەمریکادا هەن.

لێرەدا دەربارەی نەخۆشییە زایەندییە بەکترییەکان بە کورتی دەدوێین.

* *سیفلیس* (Ines - Syphilis)

هۆی تووشبوونی بەکتریەیاکە بە ناوی « Treponema Pallidum » ماوەی کرکەوتنی ( واتە بوونی بەکتریاکە لە ڕۆژی تووشبوونەوە تا دەرکەوتنی نیشانەی نەخۆشییەکە) سێ ڕۆژ تا سێ مانگە.

نیشانەکانی ئەم نەخۆشییە : نەخۆش هیچ ئازاری نییە، پاش ٤.١ هەفتە برینێک لە سەر ئەندامی نێرینە (کێر) یاخود ئەندامی مێینە(گولینک) یان کونی پیسایی پەیدا دەبێت.

نەخۆش تای لێدێت، هێلێنج دەدا، ماندوو دەبێ، ئێسکەکانی ژان دەکەن، موی سەری دەوەرێ. پاش ٦.٣ هەفتە برینەکە ون دەبێت. پاش ٢.١ مانگ برینەکە هەڵدەداتەوە چونکە باکتریاکە لە لەشدا دەمێنێتەوە.

**مەترسییەکانی نەخۆشییەکە:*

ئەگەر مرۆڤ چارەی خۆی نەکا بەکتریاکە بە هۆی خوێنەوە دەپەڕێتەوە وە دەگاتە مێشک و دڵ و زیانیان پێدەگەیەنێت.ئەگەر ئاولەمە(کۆرپەلە) تووشبێت ڕەنگە منداڵەکەی بە شێواوی لە دایک ببێت.

**چارەسەر کردنی نەخۆشییەکە:*

نەخۆش دەرزی « Penicilin »ی لێدەدرێ بۆ ماوەی ١٠رۆژ. ئەگەر نەخۆش پرهەست بوو بەرامبەر« Penicilin » ئەوا« Tetracyciline » یاخود « Erythromicin » دەخوات کە بە شێوەی حەبن.

* *چاودێری نەخۆشەکە :* پێویستە نەخۆش یەکەم و سێیەم و شەشەم مانگ، بگرە پاش ساڵێکیش لە تاقیگادا سەیری خوێنەکەی بکرێ. پاش چەند هەفتەیەک دژەتەنۆی بەکتریاکە لە خوێندا پەیدا دەبێت. پێویستە ژن و مێرد هەردوو خوێنەکانیان لە تاقیگادا سەیر بکرێت.

*******

www.ershivakurdi.org

# بیری ساغلەم

# لە تەنێکی ساغلەمدایە !

ژیانی ژیاری و پێشکەوتووی مرۆڤایەتی و قووڵ بوونەوەی مرۆڤ لە گشت لایەنەکانی ژیان، گەلێک مەرجی سەپاندۆتە سەر خودی مرۆڤە تا بتوانێ لە گەڵ رەوت و رێڕۆی ژیاندا هەڵبکات. ژیانی مرۆش بریتییە لە کۆمەڵە چالاکییەکی رۆژانە، کە زۆر بە گرینگییەوە تێیان دەڕوانێ و ئێستاش بە نیسبەت پێشوو گەلێک زانیاری پتری دەربارەیان هەیە. بۆ ئەوەی مرۆڤ بتوانێ بە بیرێکی ساغلەم چالاکییەکانی ژیانی بهاژووێ، پێویستە رۆشەنبیرێکی تەواوی دەربارەی ژیانی تەندروستی خۆی هەبێت. هەر لەم روانگەیەشەوە بە چاکمان زانی کە گۆشەیەکی گۆڤارەکەمان بۆ ئەو بابەتە تەرخان بکەین.

بابەتی ئەو ژمارەیەمان دەربارەی چالاکی زایەندییە (Sexuall aktivitet) کە ئەوەش گرینگی کەمتر نییە لە چالاکییەکانی دیکەی ژیان، هەر چەندە لە کۆمەڵگای ئێمەدا نەک گرینگی پێنەدراوە، بەڵکو باسکردنیشی تا رادەیەک بڤە بووە !!

با لێرەش ئەوە بڵێین کە لەمەودوا هەر لەم گۆشەیەدا شوێنێکی تەرخان دەکەین بۆ ئەو پرسیارانەی کە لە لایەن لاوانی خۆشەویستەوە سەبارەت بەم نەخۆشییانە بەدەستمان دەگەن. ئێمە هەوڵ دەدەین تا ئەو جێگایەی بۆمان دەلوێ، رێنوێنی لاوانمان بکەین. دیارە وەڵامی پرسیارەکان لە لایەن برای هێژامان د. زاهیر سوران ئامادە دەکرێت.



سکرتێر : تەیب باراوی ٤. ٣٦٢٥ ـ ٨.

للێپرسراو : ئاری دیمان ٥٣١٨١١٤٦ ـ ٨. تێبینی: مافی ئەندامێتی ساڵانە

بۆ گەوران ..٢، بۆ خێزان ..٣ و بۆ لاوان ..١ کرۆنە.

## راگەیاندن

لاوانی هێژا !

بەمجۆرە بە ئێوەی خۆشەویست رادەگەیەنین کە "یەکێتی راگەیاندنی کوردی" لە رۆژی ١٩٩٢/٤/٢٦ چالاکی خۆی دەست پێکرد. کاری ئەم یەکێتییە بریتییە لە ساز و ئامادەکردنی پرۆگرام بۆ تەلەڤزیۆنی کوردستان. یەکێتی راگەیاندنی کوردی بەتایبەتی پرۆگرامی ئاگاداری لەمەڕ ژیان و بارودۆخی لاوان و ئافرەتانی کورددا دەبێت.

تکامان لە ئێوەی بەرێز ئەوەیە کە هەر تێبینی، پێشنیار یاخود پرۆژەیەکتان لەم بوارانەدا بەزێن دەگا، پێمانی رابگەیەنن. هەروەها ئەو کەسانەی دەخوازن بېن بە ئەندامی یەکێتی راگەیاندنی کوردی دەتوانن بەم ناونیشانە پێوەندیمان پێوەبکەن :

Kurdisk Mediaförening
C/O Ari Diman
Forv. 9
145 51 Norsborg
08-531 811 46, 08-36 25 04



www.tesiyakurdi.org

کۆمەڵایەتی

ڕۆژی (١) یونی، ڕۆژی جیهانی منالانە. دیدار بەم بۆنەوە پیرۆزبایی
لەهەموو
منالانی جیهان و بە تایبەتی منالانی لە بیرکراوی کوردستان دەکات.

# دنیا منالانی خۆش ناوێت !

یونیسیف رایگەیاند کە خەڵکی جیهان منالانیان خۆش دەوێ، هەموو دنیا، دەوڵەتان، میللەتان و رێکخراوەکان یەکدەنگ رایانگەیاند کە بەڵێ: ئیمە منالانمان خۆش دەوێ.

بەلام راستیەکان تاڵ و پڕئازارن و پێچەوانەی ئەو قسەیە دەسەلمێنن : واتە جیهان منالانی خۆش ناوێت !

هەموو ساڵێ تەنیا بە هۆی برسییەتی بیست میلیۆن منالدەمرن، پتر لە سەد میلیۆن منالی ژێر پێنج ساڵ بە هۆی کەمی پروتینین ئازار دەکێشن. لانی کەم دەمیلیۆن منال بە هۆی نەخۆشی زۆر توند گرفتاری ئێش و ئازارن.



دەگەڵ ئەوەی کە کە لە هەشتاکاندا زانستی دەرمانی و پزیشکی لە گەشەسەندنێکی بێوێنەدا بووە، هەموو رۆژێ هەشت هەزار منال بە هۆی سورێژە و ئاودزە و کۆخەرەشە گیان دەدەن و حەوت هەزار منال بە هۆی نەخۆشی زگ چوون دەمرن.

٩٥٪ ئەو مردنانەش لە ولاتانی گەشەنەسەندوودا روودەدا.
هەموو ساڵێ ٢٥٠٠٠٠ منال بە کوێری لە دایک دەبن. جیهان ئەگەر بەم جۆرە بچێتە پێش لە نەوەدەکاندا شاهیدی مردنی نزیک بە ١٥٠ میلیۆن منال دەبین.

وەزعی منالانی کورد، هەر بەراستی تراژیدیایەکی بێ وێنەیە. گەرچی هیچ ئیمکانێک نییە تا بە پێی ئامار بتوانین حوکمێ دەربڕین. بەلام راستی زۆر لەوە زەقترە تا لە ئێمە چاوەروانی ژمارە و ئامار بکات. هەر لە کارەساتە جەرگ برەکەی پاردا لە خواری کوردستان پتر لە سەد هەزار منال بە هۆی سەرما و برسییەتی و نەبوونی ئیمکاناتی دەرمانی گیانیان لەدەست دا. تا ئێستا بەهۆی شەری شیمیایی و شەرەکانی رژێمە داگیرکەرەکان دژی نەتەوەکەمان، دەیان هەزار منال ئەندامێکی لەشیان لە دەست داوە. سەدان هەزار منال بێ دایک و باوک ماونەتەوە. ئەگەر لەوانەش گەرێین، کارتێکەری رەوانی ئەو بارودۆخە تا چەند نەوە هەر دەمێنێتەوە. منالی کورد نەک هەر بەشێکی زۆری لە خوێندن و چوونە قوتابخانە بێبەرین، بەڵکو زۆربەی ئەوانەی ئەو ئیمکانەشیان بۆ هەیە، ناتوانن بە زمانی زگماکیان دەرس بخوێنن.

ئەگەر جیهان منالانی خۆش ویستبا، هەرگیز نەدەبا دەرفەتی ئەوەی دابا کە منالانی کورد بە شێخنشینەکانی کەنداو بفرۆشترێ، بە بۆمبای شیمیایی بخنکێندرێ، بە تۆپ و تەیارە لە خوێن بگەوزێندرێ و لە چیاکانی کوردستان و بەسەرمای زستان بە بێ هیچ تاوانێک لە برسان و لە سەرمان لە بەر چاوی میلیۆنان خەڵک و دەوڵەتان گیان بدات، بەلام دنیا نەک هەر منالانی خۆش ناوێت، تەنانەت بیریشیان لێناکاتەوە !

ستۆکهۆڵم - ع. راد

سەرچاوە: گۆڤاری دنیای سخن ژمارە

www.arsivakurdi.org

# دیدار

ژماره ٢ ـ یولی ١٩٩٢

یەکێتی لاوانی کورد ـ سوید

بەرپرسیاری گۆڤار: « شەماڵ»

"دیدار"لە ساڵدا ٦ ژمارەبڵاودەکاتەوە.ئەو گۆڤارە تایبەت بە لاوانە و بە دوو دیالیکتی کرمانجی خوارور و سەرو بڵاو دەبێتەوە. "دیدار" شوێنێکە بۆ رەنگدانەوە و بڵاو کردنەوەی بیرو رای لاوان .بەرهەمەکانی خۆتان(وتار، چیرۆک، نامە، تەجرویە و بیرەوەریکانتان، وێنە و تابلۆ، خشتک و پرسیار، هەواڵی چالاکیکان و کاریکەتۆر و ...... بابەتی دیکەی خۆتانمان بۆ بنێرن. هەموو ئەندامێکی یەکێتی لاوان بۆی هەیە ببێتە بە پەیامنێر و نووسەر و هاوکاری "دیدار".ئەو کەسانەی حەزیان لەو هاوکارییەیە، تکایە پێوەندیان پێوە بگرن.ناو و نیشانی گۆڤارەکە:

Didar
Kurdiska Ungdumsforbundet
BOX 49090
100 28 Stockholm
SWEDEN

Tel: 08/ 652 85 85    Fax: 08/650 21 20

POSTGIRO . 475 85 89 - 8    ISSN 1102 - 9005

---

| | | |
|---|---|---|
| با لێک حاڵی بین ! | دیدار | ٢٩ |
| دنیا منالانی خۆش ناوێ! | ع.راد | ٢٧ |
| چەند شێعرێک | (ئیڤان / لەیلا ) | ٢٢ |
| (حەمەتاڵ) کورتە چیرۆکێک | سەرداری سدیق | ٢١ |
| نەخۆشییە درمیە ...... | د.زاهیر سوران | ٢٥ |
| چاوپێکەوتنێک لە گەڵ مستەفا دادار | شاهۆ خزری | ٢٤ |
| ژیـــانی حەریق | ف.جەهان میهەن | ١٧ |

بەرگی ١: Helena Walin ـ وێنەگر: ئاری فوئاد

# با لێک حاڵی بین!

لە دەرەوەی وڵات، دوو نەخۆشی باو هەیە. یەکەمیان لاوەکان و ئەویتریش پتر، دایک و باوکەکان تووشی دەبن.نەخۆشییەکەش لە خراپ تێگەیشتن لە ناوەرۆک و مانای راستەقینەی فەرهەنگ و شارستانییەت سەرچاوە دەگرێت.

یەکێکیان ئەوەیە کە: هەرچی بیانییە پێمان باشە و هەر چی کوردەوارییە، بە خراپ و دواکەوتووی دەزانین و ئەوەیتریشیان ئەوەیە کە : هەرچی لە کولتووری کوردەواریدا نەبێ بە کخە وبڤەی دادەندرێ. ئەو هۆیەی کە بۆتە پێکهێنەری ئەم هەستە بریتییە لە: دواکەوتوویی تارادەیەکی زۆری فەرهەنگی کوردەوارییە لە ئاست فەرهەنگێکی ئەورووپی؛ کە لاوەکانمان بە چەپڵەرێزان و هاوارەوە دانی پێدادەنێن و دایک و باوکەکانیش بە کفر و ڤینەوە بەرپەرچی دەدەنەوە و دژی ئەم بۆچوونە رادەوەستن. لایەنێکیشی ئەمەیە کە منداڵەکانمان بە هۆیٚ نەناسینی کولتووری کوردەواری و باش تێنەگەیشتن لە کولتووری خۆمان و هەروەها حاڵی نەبوون لە فەرهەنگی ئەورووپی دەگەنە ئەم ئەنجامە و، دایک وباوکەکانیش هەمدیسان بە هۆی هەزم نەکردنی ئەم شتە جیاوازانە و تەمەن و خۆگرتن لە گەڵ کولتووری کوردی، ناتوانن لایەنە باشەکانی فەرهەنگێکی غەیری کوردی ببینن. بویەش هەرچی لە ناوماندا باو نەبێ، بە مەترسییەوە سەیری دەکەن. دەرەنجامی ئەم وەزعەش ئەوەیە کە زمانێکی هاوبەش لە نێوان منداڵ و دایک و باوکەکاندا نادۆزرێتەوە.

بەشێک لەم لێک تێنەگەیشتنە ئاساییە، لە وڵاتیش هەر هەبووە و هەموو نەتەوەیەکیش تووشی ئەو کیشەیە هاتووە و دێت. ئەو جیاوازییانە هەمیشە لە ناو دوو نەوەی جیاوازدا هەبووە و هەیە و تایبەتی کوردان نییە، بەڵام ئەوەی جێگای تێڕامانە ئەوەیە کە بۆ ئەو فەرق و مەودایە لێرە( لە وڵاتێکی ئەورووپیدا) پتر و قووڵترە و زەقتر وەبەرچاوان دێت ؟

چونکو لێرە فەرهەنگی بێگانە، دمگۆ و شتێکی خەیاڵی نییە و بە پێچەوانە ئەوە کولتووری ئێمەیە کە دەرفەتی هەناسەکێشانی زۆر بۆ نییە.بۆیەش لاوەکان لێرە بەراستی مەترسی ئەوەیان بۆ هەیە کە نەتوانن کولتووری خۆمان بناسن. هەروەها سەبارەت بە دایک و باوکەکانیش دەبێ بێژین کە ئەوانیش پتر بە هۆی تەمەن و خوگرتن لە تەک کولتووری کوردەواریدا، چیکڵدانەی ئەوەیان نییە تازە کورد گوتەنی بەسەری پیری بێن عادەت بە شتێکی بەتەواو جیاواز بگرن. کە وایە چۆن دەتوانین ئاڵترناتیڤێک بدۆزینەوە ؟ واویندەچێ باشترین رێگا ئەوەبێت کە:

هەردووک لا، بەوردی و دڵ فرەوانییەوە بڕواننە مەسەلەکە و تا ئەو جێگایەی دەکرێ ناکۆکییەکان بە ژیریێژییەوە چارەسەر کەن نەک بە هەست و ئیحساس. ئێمە دەبی رێزی یەکدی بگرین و ئەم رێز گرتنەش لەوەدا خۆ دەنوێنێ کە پشومان لە سەرەخۆ بێت و هەوڵ بدەین هەردوک لایەن نیاز و هۆی نیگەرانی یەکتری حاڵی بین. ئەگینا زۆر جاران رێزدانان بە مانای بەقسەکردن نییە. راستە ئێمە کوردین و دەبێ وەک کوردیش بمێنینەوە، بەڵام کوردایەتی بەم مانایە نییە کە هەرچی کورد نەیبوو، بە کخەی بزانین و هەرچی کوردانە بوو، بە باش و بەسوودی لە قەڵەم دەین. پێچەوانەشی سەبارەت بە فەرهەنگی ئەورووپی هەر بەهەمان شێوەیە. لە نێو ئێمەدا زۆر داب و نەریت هەیە کە بە هیچ مەرجێک ئێستاکە لاوێکی کورد نابێت بچێتە ژێرباری. بۆ نموونە: بەکەم گرتنی ژن، دمکوت کردنی مناڵ، ژن بە تۆبزی بە مێرددان، نەهێشتنی مناڵ کە بە ئارەزووی خۆی بەشێکی دەرسی بخوێنێت و ... ( رەنگبێ زۆر کەس بڵێن خۆ ئەلحەملاێ لێرە ئەم شتانە نەماون، بەڵام دەبێ بە داخەوە بڵێین ئەگەرچی لێرە کچ لە سەر لانکێ مارە ناکەن، بەڵام تائێستاش کچ بە زۆری بە شو دەدەن، تا ئێستاش دایک و باوکانێک هەن کە ناهێڵن کچەکانیان لێرە لە مەکتەب دەرس بخوێنن چونکو کوڕیان لە گەڵایە، هێشتا زۆر کچ بۆی نییە وەک خەڵکی ئاسایی مەلە بکات، بۆی نییە دۆستی کوڕی هەبێت و هێستاش لێدان لە کچ بە هۆی چوونەدەر و ... باوە و ......).

باسکردنی ئەوانەش بەم مانایە نییە کە هەرچی لاوەکان دەڵێن راستە ! نا و سەدجاریش نا ! ئێمە لە هەمان کاتدا کە داوا لە دایک و باوکەکان دەکەین کە بەرامبەر بە هەموو شتێک پرهەستی(حەساسییەت) پێشان نەدەن، داوامان لە لاوەکانیش ئەوەیە کە پێیان وانەبێ هەر چیٚ نوێیە، باشە. هەرچی پاشناوێکی پێوەبوو، دەبێ حەتمەن شتێکی باش و بەسوود بێت.

وەرگرتنی فەرهەنگ خۆی فەرهەنگی دەوێت، کەسێک هەروابە سانایی ناتوانێ بە رۆژێک هەموو شتێک لە بیر بەرێتەوە و فەرهەنگێکی تر بۆخۆی هەڵبژێرێت. بۆ ئەوەی کەسێک بتوانێ ئەو کارە بکات دەبێ بەر لەهەموو شت فەرهەنگی خۆی بناسێ و کەم وکورییەکانی لێک هەڵاوێرێ، پاشان فەرهەنگەکەی تریش بناسێ و چاک و خراپەکانی لێهەڵاوێرێ. ئینجا پاش هەڵسەنگاندنی هەمووی ئەوانە دەتوانی بەرەبەرە گۆڕانکارییەک لە خۆیدا ساز بکات و هەڵبەت ئەم کارەش پێویستی بە زەمان هەیە و بە مانگ و دوو مانگ ناکرێ. بۆیەش کاتێک لاوێکی کورد دەبینین کە لە ناوەندی شاری کۆتێکی لەبەردایە کە پەنجا ئاڵقەی ئاسنی پێوەیە و هەموو شەوێک لە دیسکۆیە، بەڵام هەر کە دیتی خۆشکەکەی برادەرێکی پەیدا کردووە، وەبەر شەقانی دەدات، بۆیەش دەڵێین کە ئەم برادەرە لە کلکێوە لە شتەکە حاڵییە؛ ئەوە یانی بێ فەرهەنگییەکی تەواو؛ یانی لاساکەرەوەیەکی مەیموون ئاسا و هیچی تر.

با بە وردی هەموو لایەنە باش و خراپەکانی هەردووک فەرهەنگەکان لێکدەینەوە و هەوڵ بدەین ئەوەی باش و بە کەڵکە خۆماڵی کەین و ئەوەی خراپ و کۆنە، تۆڕی هەڵدەین ! جا چ هی کورد بێ یاخود هی غەیری کورد ! وا باشتر نییە ؟

# دیدار

ژمارە ٢ - یولی ١٩٩٢

